Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1129 27-Berfanbar- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Pêwîste kujerên herdû komkujiyên Parîsê werin işkerekirin

Ebûdê Mexso

Bê guman di dîrokê de, gelek bêbextî, lîsk û pîlan li ser welatê me û kesatiyên navdar pêk hatine. Çawa peymana Saykis Bîko welat perçer kir, di eynê demê de, rêvebir û navdarin kurd jî kirin armanc, mîna Ebdulrehman Qasimlo, Şerefkendî, Sakîne Cansiz û hevalên wê, û herî dawî komkujiya di 23 yê kanûna 2022 yan de li navenda çand û hunerê ya Ahmed Kaya li Parîsê dijî têkoşer û pêşenga jinan şehîd Evîn û havalên wê Ebdulrehman û hunermend mîr Perwer pêk hat. Hîn jî ev lîsk û pîlan berdewamin. Şehîd Evîn Botan kî ye?. Emîne Qara (Evîn Botan) di sala 1977'an de li gundê Hilal a girêdayî Qilebana Şernaxê, herêma Botanê ji dayik bûye. Ji ava kaniya malbateke welatparêz û miletperwer vexwariye. Di nava deşt, çiya, xweza û xemla berxwedana Botana egîdan de mezin bûye. Ji malbateke pir bi nav û deng, wefadar, dilsoz, xwedî nirx û li ser çanda kurdperweriyê hîn bûye. Bavê wê çîrokbêjê û destanên heremê bû, mirovekî naskirîbû di civakê de.Karîbû di şevên dirêj de, heft şev û heft rojan destan, çîrokên herêmê mîna Mem û Zîn, Keleha Dimdimê, Mîrza Mihemed, Evdalê Zeynikê.. bigota. Ev malbat bi navê malbata mala Mîrkan xuyabû û heta vê gavê xwedîyê 60 şehîdî ne. Lewra şehîd Evîn di sêzde saliya xwe de tevlî refên Gerîlayan bû. Bi vê biryara xweyî dîrokî ji sala 1990'î heta 1998'an bi qehremanî, lehengî û mêrxasî, bi bîr û bawerî, bi vîna jina azad dijî êrişên dewleta Tirkî rawestiya, nav û dengê wê li gorî bejn û bala herêma Botanê ya berxwedêr deng da. Dengê qehremaniya şer û navê wê çokê dijmin diricifandin û hejand in. Di van heşt salan de bû fermandarke mezin û bû damezrînera artêşa jinan. Di sala 1998'an de, bi biryareke dîrokî berê xwe dide cih û warê zanist û

rêxistinê, heşt mehan li cih û warê Rêber Apo tevlî koma perwerdeyê dibe. Piştî perwerdeyê biryar da ku vegere çiyayên azad û tevlî cihê rûmeta herî mezin bibe û dûbare cihê xwe di nav refên Gerîla de digre û li herçar perçeyên welat tevdigere. Jineke cansivik, zana, rewşenbîr, bi bîr û bawerî tevlî hemî pêngavên şer bû. Hezkira milet û erdnîgariya welat, heval û hogirên rê, mafê jinê û ramanên Rêber Apo bû. Bi berxwedana şehîd Sakîne bandor bûbû û rihê jina azad di kesayeta xwe de çandibû, gelek mirov perwerde kirin û li dora kar û xebata rêxistinî kom kirin.

Dema şoreşa Rojava destpêkir bi erkê xwe yê rêxistinî tevlî şerên dijî çeteyên DAIŞ'ê bû, gelek komîn û Meclis di bin sîwana rêxstinkirina gel de ava kirin. Di şerên li çiyayên azad û yên li Rojava gelek caran birîndar bû, lewra pêwistî hebû ji bo dermankirinê bi ber Ewropa ve biçe û çû li Firensa li bajarê Parîsê bi cî bû.

Bi boneya şermezarkirina salvegera 9'mîn a komkujiya 1'mîn a 9'ê Çileya 2013'an li dijî sê pêşengên jin pêk hatibû di 23'ê kanûnê de dîsa li Parîsê ev komkujî pêk hat,şehîd Evîn û herdu hevalên xwe bi pîlaneke qirêj û dijmirovî bi destê MîT a dewleta Tirk li ber deriyê navenda çandê hatin qetilkirin.

Hêjaye ku mirov bêje, wê cîhan ji çeteyên DAIŞ'ê parast, Lê mixabin li paytexta ku bi navê demokrasiyê bang dike nikarîbû şehîd Evîn û hevalên wê biparêze. Lewra divê rastiya vê komkujiya Parîs ya 2'mîn û ya 1'mîn ku têde şehîd Sakîne û hevalên wê hatin qetilkirin ji raya giştî re were işkerekirin, Işkerekirina gunehkarên herdu komkujiyan erkekî dîrokîye li ser milê dadgeha dewlata Firensî. Di heman demê de tola şehîdan rakirin, domandina riya wan û pêkanîna armancên şehîdan jî soza me ye.

'Divê li dijî dagirkeriya çandî, sînemaya Kurdî were bihêzkirin'

Hunermendên Herêma Germiyanê weşandina rêzefilmên Tirkî rexnekirin û gotin; "Rêzefilmên Tirkî hewl didin Kurdan xirab bidin nîşandan û Kurdan weke terorîst pênase dikin. Başe çawa dibe rêzefilmek wiha di televziyonên Kurdî de werin weşandin? Dijî vê êrişê divê sînemaya Kurdî were bihêzkirin."

Dinya got ku pêwîste dijî rêzefilmên Tirkî hunera Kurdî were bihêzkirin û axaftina xwe wiha dawî kir; "Huner girînge û nasnameya civakê ye. Bi rêya hunerê em dikarin girîngiyê bidin dîroka xwe."

Hunermend Huner Hesen jî li ser heman mijarê nêrînên xwe anî ziman û got; "Rêzefilmên Tirkî ku bi Kurdî

Derbarê êrişên dijî çand û hunera Kurdî, şerê taybet û dagirkeriya dewleta Tirk ya bi rêya rêzefilmênTirkî, hunermendên Herêma Germiyan di vê derbarê de nirxandinên xwe kirin.

Mamostaya beşa Hunerê Dinya Ehmed derbarê bandora huner û rêzefilmên Tirkî ya li ser civakê de got; "Weşandina rêzefilmên Tirkî ji bilî ziyana li hunera Kudî, bi hunera Kurdî re jî hev nagire. Divê çanda ku bi civaka Kurdan re guncaw were nîşandan û ji bo wekheviya jin û zilam kar bê kirin. Rêzefilmên Tirkî bandorê li ser zarokan jî dike, li ser fikirê zarokan bandorê çêdike û wana ber bi çandek nerênî ve dibe."

tên wergerandin, bi çanda Kurdî re ne guncave. Gelek caran min pêşniyarkir, pereyê ku ji bo wergera rêzefilmên Tirkî tê xerckirin, bila ji bo rêzefilmên Kurdî were xerckirin û wê hîn tiştek baştir derbikeve holê."

Huner Hesen dibêje; "Bi weşandina rêzefilmên Tirkî hewl didin Kurdan xirab nîşan bidin, di rêzefilmên Tirkî de Kurdan weke terorîst binav dikin. Başe çawa dibe ku tiştek Kurdan weke terorîst pênase bike û em jî biweşînin? Ev xeletiyek mezine. Eger hikumet alikariya hunermendan bike, dikarin karek hunerî yê baş bikîn û sudek mezin bigihîne civaka me bi xwe."

Sudoku: Bersiv 40

6	9	1	5	4	3	2	7	8
8	2	3	9	7	1	5	6	4
7	5	4	2	8	6	9	1	3
1	7	9	3	5	8	4	2	6
5	6	8	1	2	4	3	9	7
3	4	2	6	9	7	8	5	1
2	1	7	4	3	9	6	8	5
4	8	5	7	6	2	1	3	9
9	3	6	8	1	5	7	4	2

Sudoku:Pirs 41

6	7					5	2	3
4			9					
3	2					4		
2			7		9			
8			2	4	1			6
			6		3			1
		3					6	9
					8			5
1	8	5					3	2

FERHENGA BIWÊJAN

LI SER KESÊ NEZAN

Aqilê çarçiqilê/aqil e çarçiqil e:
- Dema yek tiştekî ne li gorî aqil dike, yan dibêje hingê jê re tê gotin.
Aqilê kurê tiyê min:
- Bi heman wateyê.
Aqilê kurî bi teyran re firî:
- Nezan e; tiştên beredayî dike; tiştên beredayî dibêje.
Aqilê kurî se tê birî:
- Bi heman wateyê.
Bavê wî ti xêr jê nedîtine:
Bêkêr e; pîs e; beredayî ye.
Bi xwe ve rît:
- Tişteke pir beredayî kir; tişteke pir ne di cih de kir. (yan jî got)
Devê xwe ji qûna xwe nas nake:
- Dinyanedîtî ye; tewtewe ye; beredayî ye.
Em ketin tora nezanan bûn pirzika ser zimanan:
- Ji ber ku me hevaltiya nezanan kir em ji devê xelkê derneketin.
Haya wî ji dinyayê nîne:
- Ji tiştekî fêm nake; xeşîm e; nizane ka çi diqewime.
Hir de wir de diaxive:
- Li her derê diaxive; li ber devê xwe nanêre.
Jê we ye rê hemû diçin êş:
- Mirovekî nezan e.
Kerê bi lingê paş ve girêdayî ye:
- Pir nezan e; ji tiştekî fêm nake. (Çawa ku tê zanîn ker bi lingê pêş ve tên girêdan)
Ker çi dizane ka zehferan çi ye:
- Ji bo kesê nezan tê gotin.
Kenê xwe bi xwe dike:
- Ji bo kesê tiştên beredayî dike yan dibêje tê gotin.
Li ber bayê her kesî diçe:
- Fikirê wî nîne; kî çi dibêje guhê xwe dide wan.
Li cehenemê sîran dikutin, tu kilaman dibêjî:
- Her kes bi tiştên girîng ve mijûl e, tu bi tiştên beredayî ve mijûl dibî.
Li cehenemê sîran dikutin, tu kuloran dipêjî:
- Bi heman wateyê
Ne yê avayiyan e:
- Beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê; dînik e; nizane biaxive; ne ti mirov e.
Ne yê avacihan e:
- Bi heman wateyê.
Ne yê civat û caxiyan e:
- Bi heman wateyê.
Vir de wir de diaxive:
- Bi heman wateyê.
Ya jê ve rê hemû diçin êş:
- Bi heman wateyê.

LI SER KESÊ BEREDAYÎ

Cawpîs e/cawê wî pîs e:
- Beredayî ye, bi kêrî camêriyê nayê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Rêber Apo hêvî û vîna gelan e

Ji bo azadiya fizîkî ji Rêber Ebdullah Ocelan û çareserkirina siyasî ji pirsgirêka gelê kurd re, di 10'ê Cotmehê de kampaniyek cîhanî li Silovîna hat destpêkirin, û li hemû welatên cîhanê deg veda.**R-4**

'Bi dorpêçê wê nikaribin vîna gelan bişkînin'

Endamên MSD`ê yên Şêxmeqsûd û Şehbayê diyar kirin ku bi sedema dorpêçê gel di hemû beşên jiyanî de astengiyan dikşînin û gotin; Bi hêz û berxwedaniya gel wê dorpêç têk biçe.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1129 27-Berfanbar- 2023 www.ronahi.net/ku/

LI HEMBERÎ ÊRIŞÊN QIRKIRINÊ BERXWEDANA GIŞTÎ

Dewleta Tirk a dagirker bi armanca qirkirina gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha têkbirina destkeftiyên heyî êrişên xwe dewam dike. Di 25'ê Berfanbarê de dagikeriyê li Qamişlo, Amûdê û Kobanê 22 navendên xizmetguzariyê bombebaran kir, di encamê de 8 welatî şehîd bûn, 13 birîndar bûn û ziyaneke mezin a madî pêk hat. Rêveberiya Xweser A Demokratîk , QSD, Partî û tevgerên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyan êrişên dagirkeriyê şermezar kirin û gotin, berxwedana gel wê tevahiya êrişan pûç bike.**R-3**

'Armanca me ya sereke xurtkirina rola jinê ye'

Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji bo perwerdekirin, pêşxistin û xurtkirina rola jinan di civakê de, di nava salekê de gelek piroje, kar û xebat da meşandin. Rêvebera Weqfa Jina Azad a Sûriyê Sultana Xişo diyar kir ku armanca wan ya sereke pêşxistina asta jinan di tevahiya aliyan de.**R-2**

Desteya Tendrustiyê di nava salekê de pirojeyên girîng pêk anîn

Hevseroka Desteya Tendrustiyê ya Herêma Cizîrê Hediya Abdullah diyar kir ku wan di nava salekê de gelek kar û xebat dane meşandin û pirojeyên girîng pêk anîn. Herwiha da xuyakirin ku wan herî zêde zehmetî di milê peydakirina dermanan de, dît.**R-6**

Jiyaneke tijî êş, azar û hesreta welat: Reşîdê Kurd

Helbestvan Reşîdê Kurdo yek ji helbestvanên me yên navdare ku ji ber Kurd bû, ziman, çand û nirxên xwe ve girêdayî bû di encama siyaseta înkar û îmhayê berê xwe da welatan, jiyana wî tijî êş, azar û bi hesreta welat derbas bûye.R-7

'Dadgehên şoreşger ên Îranê qesab in' Nehîr pale R-2
Êrişa dagirkeriya Tirk têkçûyîna wê nîşan dide Dilyar Cizîrî R-4
Dijminahiya li dijî Kurdan xilas nabe Zekî Bedran R-5
Operasyona şoreşgerî ya Gerîla Farûk Sakîk R-5
Civaka komunal Rohat Bulut R-6
Belgeyên saziyên Rêveberiya Xweser ne bi Kurdî ne.... çend têbînî Kemal Necim R-7

‘Armanca me ya sereke xurtkirina rola jinê ye’

Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji bo perwerdekirin, pêşxistin û xurtkirina rola jinan di civakê de, di nava salekê de gelek piroje, kar û xebat da meşandin. Rêvebera Weqfa Jina Azad a Sûriyê Sultana Xişo diyar kir ku armanca wan ya sereke pêşxistina asta jinan di tevahiya aliyan de.

Avêsta Mnaf/Qamişlo

Di Îlona 2014’an de bi dirûşmeya‘Jina Azad Bingeha Civaka Azad e’ Weqfa Jina Azad li Rojava hat damezrandin. Armanca damezrandina wê jî ew e ku pirsgirêkên civakî li Bakur û rojhilatê Sûriyeyê bên çareserkirin û civak di hemû warên jiyanî de bê pêşxistin. Piştî pêşketina mezin di herêma bakur û rojhilatê Sûriyê de pêk aniye û ji bo ku bigihîjin hemû jinên herêmê,di konferansa 2021’ê de biryar dan ku navê xwe biguherînin û bikin ‘Weqfa Jina Azad a Sûriyê’

Di Weqfa Jinê de gelek beş hene, di nav de beşa perwerdeyê ya ku karînên jinan û têkiliyên wan ên civakî û tendirustî di hemû waran de bi pêş dixe ji bo binesaziya civakê xurt bike û beşdariyên jinan di bernameyan û projeyên pêşveçûnî de bi pêş bixe.

Di nava sala 2023`an de Weqfa Jina Azad a Sûriyê (WJAS) li herêma bakurê û rojhilatê Sûriyê li ser zehmetiyên jinan yên aborî, siyasî, tenduristî û çandî bi rêbazên wekî perwerdehiyê xebitî. Weqf bi xebatên xwe ji bo van xalan têdikoşe, wekî wekheviya di navbera zayendan de, ziman û olên cuda yên herêmê û rêzdariya di navbera netewe, çîn û komên civakî yên bakur û rojhilatê Sûriyê de. Piştî Şoreşa Rojava ku li bakur û rojhilatê Sûriyê hate destpêkirin û Rêveberiya Xweser hate avakirin, yek ji saziyên ku hate vekirin Weqfa Jina Azad a Sûriyê bû, Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji bo jinan derfetên kar pêş xist. Armanca Weqfa Jin ew e ku jinan di hemû aliyan de bi rêxistin bike, ji bo jinên ku pirsigrêkên wan hene çareseriyê bibîne û ji bo ku jin bikaribin hêza xwe bibîne û nas bike drfetên kar dide wan. Her wiha salane di hemû beşan de perwerdeyan li dar dixe. Komîteyên navenda weqfa jina azad li Qamişlo ye, ofîsa wê li bakur û rojhilatê Sûryeyê belav in. Li Dêrik, Girkê Legê, Çilaxa, Dirbêsiyê, Hesekê, Kobanê û… hwd. Li kampan jî heye; kampa Hol, WaşoKanî û Roj. Di hundirê Weqfê de gelek Komîte hene; Komîta tendirustî, perwerde, proje, dîblomasî, mafnasî û daraya her komîteyeke jî pratîk û teorî wê heye.

Wîqfa Jin hewl dide ku jin ji hizrê zilam xilasbike

Her wiha ji ber krîza ku Sûriyê tê re derbas dibe nirxê lênerîna bijîşkan biha bûye, ji ber wê jî her nexweşaxaneyeke bijîşkeke taybet ya jinan û zarokan lê dimînin û ew tên tedawîkirin, ev yek gaveke pîroz bû û ji wê encamên baş hatin dîtin. Herwiha nexweşxaneyeke li gundewarên bajarê Dêrikê hat avakirin, ew jî ji bo jinên ducanî yên dûrî nexweşxaneyên bajar e. Di heman demê de komîteya perwerdeyê semînerên pratîkî û teorî didin jinan ji bo guhertina zihniyetê, ji ber ku berî şoreşa Rojava jinê bi zihniyeta mêranî dihizirî, ji ber vê yekê jî perwerde ji jinan re di Weqfa Jina Azad de hate dayîn da ku zihniyeta mêr ji civakê rabe û jin xwe bi xwe birêve bibe, vegere rastiya xwe zanibe rola wê di civakê de çi ye. Her wiha bi van semîneran weqfa jinê xwest bi jinên kedkar re bibin alîkar, baxçeyên zarokan hat vekirin armanca wan jî ew e ku ne tenê wan fêrî pênûs û lênûsê bikin, fêrî çand û exlaq jî bikin.

Piroje ji bo zarokan

Weqfa Jin bexçeyên zarokan ji bo zarokan vekir, jinên karker hene diçin karê xwe nikarin zarokên xwe bi tenê li mal bihêlin, ji bo wê jî weqfa jinê bexçe vekirin, armanc ew bû ku jinên karker bi rehetî karê xwe bikin. Herwiha navendên mûzîkê jî hatin vekirin, armanc ji vekirina wê jî ew e ku zarokên penaber têde fêrî amûrên muzîkê bibin, ji bo ku ji wê rewşa şer derkevin. Tiştekî pir girîng bû carnan komîteyên weqfa jin yên mûzîkê beşdarî şahî û mîhrîcanan dibûn. Cihekî werzîşê li navend Weqfa Jin a Azad ji jinan re hat vekirin.

Weqfa jin ji bo nasnameya jinê kar dike

Ne tenê herêm, li hemû kampan jî ev kar û xebat tên kirin. Li kampa Hol û Roj jî weqfa jin ofîsên xwe vekirin, her wiha kar û xebatên xwe bi awayekî rast bi rêve dibin, ji ber ku jinên DAIŞ’ê ne, ku ew hizrê DAIŞ`ê ji hole were rakirin û tune kirin. Weqfa jin Ji bo nasnameya jin kar dikin û derfetê didin wê jinê. Di heman demê de li kampa Hol û Roj pir karan didin meşandin semîner ji jinan re tên dayîn, ziyaretî kona tê kirin û piştre semînerên fikrî ji wan re tên çêkirin û encamên gelekî baş tên bidest dixin, li wan kampan hin jin ew cil û bergên reş guhertin. Ji 2014’an heta 2020’an navê Weqfê, Weqfa Jina Azad a Rojava bû, piştre guhertin hat çêkirin û navê weqf jî bû ‘Weqfa Jina Azad a Sûriyê’ ji ber ku bi nasnama jinê kar dikin ne tenê herêmekê kar dikin an jî pêkhatiyekê. Her kesê ku di Weqfê de kar dike ji hemû pêkhateyan kar dikin. Di demê pêş de jî weqf dixwaze projê xwe bêhtir xurtir bikin. Sala bê jî dixwaze ku ev perwerdê ji jinan re tên kirin koperetîf vekin.

Piroje

Weqfa Jina Azad a Suriyê, di sala 2023`an de gelek kar û xebat da meşandin. Her wiha pirojeyên ku herî zede li ser baldarî hat kirin jî, perwerdê bû, perwerde ji bo hemû jinan ku di nav de endamên weqfê û hem jî li hemû komînan, saziyan û tax û gundan. Di vê derbarê de 1524 semînerên fikirî hatin dayin, mijar jî piranî li ser tundiya ku li ser jinê tê kirin, zewaca temen biçûk, zagonên malbatî û ziyaretên mala jî pir hatin kirin. Her wiha Komîteya tendirustî a weqfa jin di sala 2023`an de rola xwe baş lîst û bi aktîf hereke dikir, pir sermînerên tendirustî dan, hem tewrî û hem jî piratîkî, nêzî 2500 semînerên tendrustî hatin dayin û 728 perwedeyên mudaxila lezgîn hat dayîn, hijmara neweşên ku ji aliyê nexweşxaneyên weqfa jin ve hatina tedawî kirin 5424 bûn, hijmara nexweşan ji salên borî de zedetir bûn, sedema wê jî ji ber ku nirxên derman û bijîşan pir buha bû û qirîzekê pir mezin a aborî li ser civakê hat kirin. Ji ber vê yekê nexweşxane û mustewsatê weqf gel pêşwaz kirin ku heya astekî bi wan re bibin alî kar.

Pirojeyên ku nehatin pêk anîn

Weqfa jin dixwest ku di sala 2023`an de ofîsek li Şeheba û Helebê veke, ji bo vê jî hazirtî hatin kirin ku were vekirin. Lê hin pirsgirêkên awlehî li pêşiya wan bûn asteng û hat îbtalkirin. Di nava sala 2024`an de û di nava bernameya me ya sereke vekirina ofîsa weqf li Şeheba û Helebê ye û beşên perwerdan ji bo jinan hîn zêdetir bikin.

Zehmetî

Di heman çarçoveyê de Rêvebera Weqfa Jina Azad a Sûrî Sulatana Xişo balkişand li ser zehmetî û astengiyên ku dikevin li pêşiya wan û wiha got: “Em wekî weqfa jin destpêkê zehmetiyên me ji aliyên aborî hene û ev jî dibe asteng li pêşiya me ku gelek pirojeyê me ji bo aboriyê tên rawistandin. Ji ber ku pirojeyên me pirojeyên civakî ne, her wiha ew qezence mizin di nava pirojryê me de tune ye û aboriya me ji pirojeyên me tên û tû rêxistin û sazî nabe alîkar, ev ji bo me zehmetoya herî mizine. Lê ji bo jinan bo rastî di destpêkê de Weqf li jinan digeriya, lê niha jin tên serdana weqfê dikin, li derdora me kom dibin em ê jî li gor nerînê jinan bin. Çi kar û xebat ji me were xwestin em ê bikin bi hemû jinan re alîkarbin destekê bidin wan.”

Ji Pênûsa Jin

‘Dadgehên şoreşger ên Îranê qesab in’

Nehîr Pale

Sala 1979`an sîstema Îranê dadgehên şoreşgerî ava kirine. Piştî şoreşa Îranê çêbû li ser perspektîfa Eyet Allah Xumeynî ev dadgehên şoreşgerî yên Îranê hatine ava kirin. Di destpêka avakirina wan dadgehan de armanc ew bû ku hemû kesên bi Şah re xebitîne û alîgirên sîstema wî bûn, werin darve kirin. Ev biryar ket piratîkê de û bi sedan kesên girêdayî Şah bûn hatin darve kirin. Diviyabû ev dadgeh demkî bane û heyanî niha navê wê di destûrnameya sîstema Îranê de derbas nabe.

Mijara balkêş ew e ku di destûra Îranê de navê dadgehên şoreşgerî nîne û ji hemû aliyan ve biryar di destê wan de ye. Ji çavkê kîjan jin an mêr li ser sîstema Îranê xeter were dîtin wê wan bavêjin dadgehên şoreşgerî, ji xwe tu kes nikare parêzer bigre û parastina xwe bike. Di van dadgehan de her tişt li ser wan qedexe ye, kesek nikare wan serdan bike, her wiha bê ku werin dadgehkirin hukim li ser tê birîn. Li gorî Kovara Lêkolînên Îranê ya sala 2018`an ji sala 2010`an heyanî sala 2017`an nêzî 500 hezar kes di dadgehên şoreşgerî de hatine darve kirin. Sîstemê ew girtîgehên şoreşger weke parastgeh dide bikar anîn.

Dadgehên Engîzasyon sala 1199`an di çaxên navîn ji aliyê Dêrê ve hatine ava kirin û li cîhana Xiristiyanan belav bûne, di van dadgehan de hemû kesên ku li dijî ola Xirstiyan hatine dîtin ew kuştine, darvekirine û şewitandine, bi taybet jin bi hezaran di bin navê sihirbazin hatine şewtandin. Ev dadgeh jî ji aliyê Dêrê ve demkî hatibûn ava kirin lê heyanî sedsala 16`emîn berdewam kirin. Niha cudayî di navbera dadgehên şoreşger û dadgehên engîzasyon de tine ye. Kijan insan li dijî sîstema Îranê derbikeve yan jî rexne bike wê bavêjin dadgehên şoreşgerî û darve bikin. Bi taybet jina ku siyasetê dike, mafên mirovan diparêze yan jî hîcab nade serê xwe wê berê wê bidin dadgehên şoreşgerî. Mînaka wê jî Nergiz Kerîm Mehmedî ye.

Siyasetmedara jin Nergiz Mehemedî niha li dadgehên şoreşger tê girtin. Ji dema ku zanîngeha beşê fêzikî dixwend bi tevlîbûna rêxistinan li hemberî sîstema Îranê derket. Tûndiya li ser jin tê meşandin û mafên mirovan xwarin qebûlnekir. Ji xwe cara yekemîn sala 1998`an ji aliyê sîstema Îranê ve tê girtin. Ew li bajarê Zincan ê Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye û piştî xwendina xwe bi dawî dike destê bi rojnamevaniyê dike. Di gelek rojnameyan de nivîsên siyasî dinivisîne û sîstema Îranê rexne dike.

Sîstema Îranê 13 caran çalakvana siyasî digre û heri dawî sala 2021`an wê girtin û niha di dadgeha şoreşgerî ya paytexta Îran, Tehran de ye. Destûr nadin ku kesek wê bibîne yan jî parêzer bigre. Dadgeha şoreşgerî bê ku Nergiz Mehmedî dadgeh bikin hukmê 16 salan zîndan lê birîn.

Siyasetmedara jin Nergiz Mehmedî tu carî gav paşve ne avêtiye, niha temenê wê gihîştiye 51 salî, hevjîn û her du zarokên wê li Ewrûpa ne lê ew ji Îranê derneket û têkoşîna xwe ya siyasî berdewam kir. Herî dawî sîstema Îranê dema ku xwest wê derxin pêşiya dadgeha şoreşger Nergiz Mehmedî helweste xwe diyar kir û got: `Dadgehên şoreşger qesabin û ez dernakevim pêşiya wan`.

‘Hewcedariya wêjeya kurdî bi rexneyê heye’

Rexnevan Mehmûd Ebdo diyar kir ku pirtûka Rêber Hebûn a bi navê Jihevvekirina Sembolan di Romanên Helîm Yûsiv de, berhemeke bi nirx e, herwiha hewcedariya wêjeya kurdî bi rexneyê û berhemên wiha heye.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Rexnegiriya wêjeyî yek ji qadên herî girîng yên ji bo pêşxistin û dewlemendbûna wêjeyê ye. Kurdên Rojava jî heya astekê cihê xwe di vê qadê dê weke rexnegiriya wêjeya cîhanî negirtine û kesên rexnegirên wêjeya kurdî li Rojava kêm in. Dema ku rexnegirên wêjeyê kêm werin dîtin, helbet wê berhemên rexneya wêjeyî kêmpeyda bin û wê geşedana wêjeyî jî pêk neyê.

Lê dîsa mijara rexne û wêjeyê mijara xeyala rewşenbîr, nivîskar û wêjevanên kurdên Rojava ye. Êdî hewldan, xebat û gavên destpêkê ji bo rexneyê hatine avêtin. Yek ji van xebatan jî, keda rexnegir, nivîskar û helbestvan Rêber Hebûn di berhema wî ya bi navê Jihevvekirina Sembolan di Romanê Helîm Yûsiv de, ye.

Rêber Hebûn yek ji rexnevan û nivîskarên kurd e û di sala 1987’an de li Minbicê ji dayîk bûye. Ev pirtûk yek ji berhemên wî ya ku di Adara 2020’an de, li Almaniyayê, bajarê Dosdorfê çap kiriye û hejmara rûpelên wê 243 rûpel in.

Rêber Hebûn di zimanê kurdî û erebî de şareza ye û helbest, lêkolînên rexneyî û gotarên cihêreng dinvîsîne. Berhemên wî jî ev in: Qêrînên Roniyê(Helbest) di sala 2016’an de, Rewrewk û Nêrîn (Pexşan) di sala 2017’an de, Komekên Kurdistanî (Pexşan) di sala 2019’an de, Ramanên Biqîr di sala 2019’an de.

Berhema Hebûn a bi navê Jihevvekirina Sembolên Romanên Helîm Yûsiv, weke lêkolîneke rexneyî ya di derbarê tevahiya romanên Helîm Yûsiv de ye. Lêkolîna Rêber Hebûn ji du beşan pêk tê, beşek jê romanên Helîm Yûsiv digre dest û ya din jî lêkolîneke di derbarê kurteçîrokên Helîm e.

Herwiha Hebûn bi armanca dahurandin û eşkerekirina sembolên ku romannivîs Helîm Yûsiv di romanên xwe de bikar anîne, pirtûkek bi zimanê erebî nivîsand.

Têkildarî pirtûka Rêber Hebûn a bi navê Jihevvekirina Sembolan di Romanên Helîm Yûsiv de, rexnevan û endamê HRRK’ ê Mehmûd Ebdo ji rojnameya me re axivî.

‘Pirtûka Rêber Hebûn berhemeke giranbuha ye’

Mehmûd Ebdo diyar kir ku pirtûka Jihevvekirina Sembolan di Romanên Helîm Yûsiv de berhemeke Rêber Hebûn a giranbuha ye û wiha anî ser ziman: “Pirtûika Rêber Hebûn a bi navê Jihevvekrina Sembolan di Romanên Helîm Yûsiv de, berhemek rexneyî ya berfireh e. Rexnevan Hebûn lêkolîneke kûr di derbarê 6 romanên Helîm Yûsiv de, çêkiriye. Herwiha Helîm Yûsiv jî rewşa ku kurdên Rojava ya 30 salên dayîn di romanên xwe de nivîsiye. Weke desthilatdariya Rêjîma Be’isê, gendeliya siyasî û civakî, nehevrêziya partiyên kurdî û hwd… Helîm Yûsiv jî di naveroka romanên xwe de gelek xalên veşartî û sembolane têkldarî kesayet û lehengên romanên xwe, raman û hwd… bêşîrove hiştibûn. Helîm Yûsiv bi zimanê kurdî û erebî diniviise, em dikarin bibêjin Helîm Yûsiv romannivîsekî cîhanî ye û berhemên wî bi zimanê erebî, îtalî, tirkî, elmanî, inglîzî û farsî jî derketine. Lewma Rêber Hebûn jî xwest ku van sebolên ku Yûsiv di romanên xwe de bi kar anîne, bide xuyakirin. Hêjayî gotinê ye ku pirtûka Hebûn berhemeke balkêş û giranbuha ye, bi zimanê erebî hatiye nivîsîn û wê di demeke nêz de, li Bakurê Kurdistanê bi zimanê kurdî jî were wergerandin. ”

‘Pirtûkxaneya kurdî hewcedarî bi pirtûkên rexneyî ye’

Mehmûd Ebdo destnîşan kir ku rexne û wêje hev temam dike û pirtûkxaneya kurdî hewcedarî berhemên rexneyî ye û wiha got: “Me weke HRRK’ê biryar da ku 3 pirtûk yên ji weşana xwe, di festîvala Rojava ya Çand û Hunerê de

îmeze bikin. Berhema Rêber Hebûn jî yek ji van pirtûkan bû ku HRRK’ê min û rexnevan Silêman Mehmûd erkdarên îmzekirina wê kirin. Hejmara romanên kurdî kêm e û pirtûkên rexneyî di warê romanê de û ji bo hemû cureyên wêjeyê tune ne. Ji ber vê yekê jî ne helbest û ne roman û tevahiya cureyên wêjeyî li pêş nakeve. Pêwîstiya wêjeya kurdî li Rojava gelekî bi rexneya wêjeyî heye ji ber ku rexne û wêje hev temam dike. Di heman demê de pirtûkxaneya kurdî hewcedarî pirtûkên rexneyî heye. Pirtûka Jihevvekirina Sembolan di Romanên Helîm Yûsiv de, ji bo rexneya wêjeyî xwedî sûdmendiyekê ye. Lewma bi armanca ku hemû xwîner sûdê jî bigrin, HRRK’ê da çapkirin. ”

Jiyaneke tijî êş, azar û hesreta welat: Reşîdê Kurd

Navenda nûçeyan

Helbestvan Reşîdê Kurdo yek ji helbestvanên me yên navdare ku ji ber Kurd bû, ziman, çand û nirxên xwe ve girêdayî bû di encama siyaseta înkar û îmhayê berê xwe da welatan, jiyana wî tijî êş, azar û bi hesreta welat derbas bûye.

Gelek pêşeng û zanayên me hene di dîrokê de, xalekî ku pir dişibin hev berxwedan û serî rakirina wan li dijî zilm û zora dewletê ye ku di encama wê de jî jiyanek bi êş, zor û zehmetiyan, di nav hesret û bêrîkirina welêt de derbas kirine. Yek ji wana jî helbestvanê navdar Reşîdê Kurdo ye.

Reşîdê Kurd yan Reşîdê Kurdo li sala 1910’an li bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê hatiye dinê. Ji gundê Rewşatê yê navçeya Dêrîkê ye ku li wir zaroktiya xwe derbas kir. Li gorî hinek çavkaniyan navê dayika Reşîdê Kurdo, Zînê ye.

Sedema ku paşnav kirîbûn Kurdo yan Kurd jî pir zelale; ji ber ku Kurd bû û hêj zagona dewleta Tirk ya dagirker ku navê Kurdan li gorî zimanê xwe ferz dikir û Turkoglu, Alparslan, Canturk, Ozturk û hwd. din nexistîbû meriyetê. Bi awayekî xwezayî bi rêya herî sade, ji ber ku ji

ziman, çand û welatê xwe hez dikir û dida hezkirin, bi wî navî hatîbû xîtapkirin. Ji xwe wan salan navê kes yan li gorî navê bav, yan dayik, yan li gorî netewa wî dibû. Terzê xwenasîna mirovan ya herî xwezayî, herî saf û pak jî ew şêwe bû.

Reva wî ji asê mayîna nav dîwarên girtîgehan diparêze

Demekê li bajarê Konyayê medresa xwe didomîne. Ji ber meylên wî yên Kurdbûnê sala 1930’an li Konyayê cara yekê tê girtin. Li Reşîdê Kurdo 2 sal cezayê girtîgehê dibirin, lê ew Kurdek zîndanîbûnê ji xwe re qebûl nedikir bû û firsenda revê peyda kir. Wê demê tenê mehekê karîbûn di girtîgehê de hepis bikin. Piştî direve dema cara duyem jî digrin û dixin girtîgehê cardin ji girtîgehê direve û xwe digihîne Sûriyeyê, Rojavayê Kurdistanê. Li navçeya Amûdê bi cih dibe û lêkolînên xwe li ser zimanê dayikê û giramêr kûrtir dike. Li wir pirtûka xwe ya yekem ya bi navê “Zimanê Kurdî û Gramêra Wê” diniviise û sala 1956’an li Beyrûtê dide çapkirin.

Reşîdê Kurdo li gel Seydayê Cegerxwîn, Kamîran Bedîrxan, Heciyê Cindî, Erebê Şemo, Qedrîcan, Osman Sebrî ji bo parastina zimanê dayikê û çanda Kurdi bi hevre kar meşandine. Lê li Sûriyeyê jî gelek zehmetî dikişand. Qeyranên siyasî derdiketin û di encama wê de ew jî neçar ma biçe Iraqê. Lê Irak jî dema sala 1958’an ji bo penaberiyê serlêdan kir, serlêdana wî nehat qebûlkirin û ew vegrandin Sûriyeyê. Wî demî bi salan di girtîgehan de ma.

‘Bila niha nemirim, hêj karên nebirî serî mane’

Sala 1949’an helbestvanê me yê navdar Reşîdê Kurdo li Sûriyeyê bi nexweşiya weremê dikeve û bi nexweşiyek giran ya kezebê re bi salan têkoşîna jiyanê dide. Çawa nexweş û perîşan ji girtîgehê ber didin sala 1967’an berê xwe dide Yêkitiya Sowyetan û ji bo tedawiyê diçe Bulxarîstanê. Lê li wir tenê salekê dikare bijî û 20’ê Kanûna 1968’an diçe ser dilovaniya xwedê. Tê gotin dema dizanê wê bimire van gotinên gelekî bi wate dike; “Hîn pir kar û barên min hene ku divê ez bikim. Min ew karên xwe nebirine serî. Na divê ez niha nemirim. Divê ez vegerim bakçeyên Dêrîkê ku min ji mêj ve bêriya wir kiriye, paşê bila mirin were.”

Berhemên wî evin;

Di nav pirtûkên Reşîdê Kurdo de 3 berhemên taybet hene. Yek ji wan pirtûka bi navê “Rêzimanê Kurdî” ku li ser zimanê dayikê û gramera wê lêkolîn kiriye; pîrtûkên “Ez Reşîdê Kurdî” û “Kerwan” yên helbestên wî ne. Helbestek wî ya navdar jî ‘Ez’e. Berfirehiya helbestê wiha ye:

EZ
Bextiyarim, bextiyarim
Çimkî ez proleterim
Peyayekî bênav û nîşanim
Ji wê ordiya canbêzarim
Di meydana azadî de
Rapêçayî, her li karim
Heya sax bim ez giranbarim
Ji xweşiya jînê loma
Destşustî, bêpişk û parim
Serxweş nabim bi şabaşan
Pesinkaran re neyarim
Ser danînim ji pûtan re
Pûtşikênekî çi dijwarim.

Têbînî

Belgeyên saziyên Rêveberiya Xweser ne bi Kurdî ne…. çend têbînî

Kemal Necim

Di deh salên dawî de, li Rojavayê Kurdistanê, yek ji qadên ku guherîn û geşedaneke mezin lê çêbû, qada fêrbûna bi zimanê Kurdî bû. Geşedan û pêşketina ku di qada zimanê Kurdî de çêbû ewqas bi bandor û mezin bû ku mirov nikare rewşa niha û ya berî deh salan berawerdî hev bike. Çawa ku berî deh salan ji sedî kêmî yekî kurdan dikarî bi Kurdî bixwîne û binivîsîne, lê niha bi deh hezaran xwendekar li dibistan û peymangeh û zanîngehan bi zimanê dayikê dixwînin û dinivîsin, her wiha piraniya beşên civakê jî bi alîkariyê sazaiyê cuda fêrî xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî bûn.

Perwerdeya zimanê Kurdî, her wiha fêrbûna xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî, têra pêşigirtina metirsiyên windabûna ziman nake, eger ku ziman bi stûnên bi hêz neyê asêkirin, weke bikaranîna zimanê Kurdî di hemû warên jiyanê de û hemû dezgehên rêveberiyê, perwerdeyê û kargêriyê de û têvedana xwendekaran ji bo bikaranîna zimanê Kurdî di hemû astên xwendinê de, ji seretayî heta zanîngehê. Pêşxistina metodên hînkirina zimanê kurdî bi rêya hêsankirina rêzimanê. Her wiha pir girîng e ku zimanê Kurdî bibe zimanê rojane yê hemû sazî û dezgehên ragihandinê. Girîng e jî ku zimanê axaftina rojane û dan û standinên rojane yên çalakiya civakî û dan û standina sûk û bazarê jî bi Kurdî be. Lê ji qadên pir girîng ku pêwîst e zimanê Kurdî weke zimanê sereke lê bête bikarnîn, qada sazî û dezgehên fermî yên Rêveberiya Xweser e. pir pêwîste ku hemû saziyên Rêveberiya xweser bi hemû dezgeh û meclisan, di dan û standin, belge, name, birayr, giştîname bi zimanê Kurdî pêk bînin, li kêleka zimanê Erebî ku ew jî li gorî Hevpeymana Civakî zimanekê fermî yê sereke ye.

Weke tê zanîn ku hemû desgeh û desteyên Rêveberiya Xweser rojane bi dehan belge, biryar, name û giştînameyan dertînin, çi ji bo têkiliya rasterast bi gel re, çi di têkiliya navxweyî ya saziyan de. Lê di nava deh salên dawî de her mijara ku dezgehên Rêveberiya Xweser di çapemenî û nivîsa xwe de zimanê Kurdî bikar nayîne bûye cihê rexne û dilgiraniyê.

Daxuaynî û belgeyên rêveberiyê piranî bi zimanê Erebî der tên, eger carna jî li kêleka wê bi zimanê Kurdî bêne derxistin jî, pir bi kêmasî û şaşiyên ku nayê pejirandin dertên.

Bê guman dema ku mirov hewl û xebatên Rêveberiya Xweser ên geşkirin û pêşxistina zimanê Kurdî binêre, her wiha guhpêdan li perwerdeya bi zimanê Kurdî û vekirin û rêvebirina bi hezaran dibistan û peymangeh û zanîngehan û çapkirina bi milyonan pirtûkên pwerwerdeyê, eger mirov li van hemû tiştan binêre, dê bibîne ku rêveberiya xweser pabend û girîdayî bikaranîna zimanê Kurdî ye. Anku mirov dikare bêje ku qelsî û kêmasiya nekaranîna zimanê Kurdî di saziyên rêveberiyê de, ne helwest e, lê tuneyî ye. Diyar e ku rêveberiyê guh nedaye ku kesên pispor ku karibin belgeyên saziyan bi zimanê Kurdî derînin, erkdar nekirine, yan kesên ne pisopr erkar kirine, lewma yan zimanê Kurdî bikar nayinin, yan jî bi şaşî û kêmasî bikar tînin. Wê demê çareseriya vê kêmasiyê pir hêsan e. pêwîste Rêveberiya Xweser di dîwanên hemû dezgeh û saziyên xwe de pisporên xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî erkdar bike. Di vê derbarê de dikare alîkariyê ji deseya pwerwerdeyê yan jî ji Sazaiya Zimanê Kurdî SZD`ê bixwaze.

‘Bingeha Dadgeha Civakê Desteya Lihevanînê ye’

Rêveberê Desteya Lihevanînê yê herêma Cizîrê Nûreldîn Şakir diyar kir ku ji bo çareserkirina dozên sivîl 92 Desteyên Lihevanînên xebatên girîng û pîroz didin meşandin. Herwiha armanc ji avakirina Desteya Lihevanînê avakirina civakeke bi exlaq û bê pirsgirêk e.

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Avakirina Desteya Lihevanînê di destpêka aloziya Sûriye de bû mîrasekî berfireh ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê, bi damezrandina Rêveberiya Xweser re, Desteya Lihevanînê berpirsyariya çareserkirina van pirsgirêkan rahiştê. Di sala 2011`an de û di destpêka aloziya Sûriyê re Qomîteyên Lihevanînê hatin avakirin, wê demê Dîwana Edaletê û Dadgehên gel nehatibûn avakirin, di malên Gel de Qomîtên Lihevanînê hatin avakirin û pirsgirêkên welatiyan dihatin çareserkirin, li ser vê bingehê kar û xebat dihat meşandin. Herwiha ji sala 2012`an û şon ve pêwîstî hat dîtin ku dadgeh bên avakirin, ji ber pirsgirêkên cedî, cînayî, gazî, dizî, kuştin, madeyên hişbir û hwd… hene û ev pirsgirêk bi Lihevanînê tenê nayê çareserkirin, hewcedarî bi avakirina dadgehan hat dîtin û Desteyên Lihevanînê di Dadgehê de cihê xwe girtin.

Di derbarê kar û xebatê Desteya Lihevanînê de rêveberiya Desteya Lihevanînê yê herêma Cizîrê Nûreldîn Şakir ji rojnama me re axivî.

Nûreldîn Şakir diyar kir ku dema Dadgeh hatin avakirin piryaniya kesên ku cihê xwe tê de digirt ji endamên Qewmîteyên Lihevanînê bûn û wiha got: “Di destpêka avakirina dadgehan de, piraniya kesên ku cihê xwe tê de digirtin Piraniya wan endamên qomîteya Lihevanînê bûn, ji ber ew xwedî tecrîbe, mirovên zane û di nava civakê de dihatin qebûlkirin. Herwiha di bajarokan de me Qomîteyên Lihevanên birêxistin kirin, li ser bingeha dozên civakî, ji ber di civaka me de irsekî olî, civakî, kurdewarî, kevneşopî, çand û exlaqê civakî hene. Di civakê de lihevhatin naskiriye û barê dadgehê sivik dike, bingeha dadgehê jî lihevanîne. Dozên sivîl li gorî zagonên e, nabe yekser pirsgirêkên wan derbasî Dîwana Dadgehê bibe, divê di Desteya Lihevanînê re derbas bibe, ev yek girîngiya erka Desteya Lihevanînê û dozên sivîl in.”

Desteya Lihevanînê kar û xebatekî pîroz dide meşandin

Şakir di berdewamiya axaftina xwe de kar û xebatên Desteya Lihevanînê da xuyakirin û wiha got: “Kar û xebatên Desteya Lihevanînê ji komînê dest pê dike. Dema ku dozeke civakî yan pirsgirêkên civakî derdikeve, mehek bi komînê re heye ku vê dozê çareser bike, heger di komînê de nehat çareserkirin wê ji bajarok re rakin, li wir jî mehekê dimîne, heger li bajarok jî neyê çareserkirin, radikin Qomîteya Lihevanînê ya navçeyê, heger lihevanî pêk hat, herdû aliyan vedguherin sekê lihevanînê û ji aliyê desteya rêveber ve tên erêkirin û belgeya rêveberiyê tê amadekirin û sererastkirin. Ji xwe ji destpêka avakirina Desteya Lihevanînê heta niha kar û barekî gelekî pîroz kirin e. Di van salên derbasbûyî de hejmarê dozên ku hatine çareserkirin zêdetirî 200 hezar dozin. Desteyên Lihevanînê ên girêdayî me nêzî 92 deste, di komîn, bajarok û navçeyan de cih digirin, mehane nêzî hezar dozî ji wan re tên. Di îsal de hejmara dozên ku ji mere hatine 9hezar dozin û ji wan 7 hezar û 500 doz hatine çareserkirin. Di lihevanînê de çareserkirin bidawiye lêveger tuneye, ji ber bi îrada herdû aliyên nelihev çareserî çêdibe, ne weke biryarên dadgera ne. Di biryarên dadgeran de mafê alîk ji aliyê din bêtir e.”

‘Gel bibe hevalbendê dana biryarê’

Nûreldîn Şakir di dewamiya axaftina xwe de diyar kir ku armanca wan ji avakirina Desteya Lihevanînê avakirina civakeke bê pirsgirêke û bi exlaq û wiha got: “Armanca Desteyên Lêhevanînê avakirina civakekî bê pirsgirêke û bi exlaqe, ji ber welatê me di rewşên gelek zor û zehmet de derbas dibe. Herwiha dijminên gelê kurd, bi avakirina pirsgirêkan di navaber pêkhateyan de xwe didin avakirin, ji bo wê me xwest cara yekêm ku gel bi xwe bibe hevalbendê dana biryar û çareserkirinê. Di zagonên hiqoqî de nabe kes heqê xwe bi destê xwe bistîne, ji ber heger kesek kuştinê bike yê din jî kuştinê bike, rêzê nedin dadgehê, ji bo wê çandên kevinperest û heyvhilandin, niha hatine sîstemkirin.”

Avakirina civakekî bê pirsgirêk û bi exlaq

Rêveberiya Desteya Lihevanînê ya herêma Cizîrê Nûreldîn Şakir axaftina xwe wiha qedand: “Qewmîteyên lihevanînê isbat kirin ku gel dikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin û ev yek roleke erînî di nava civakê de lîstin. Herwiha Desteya Lihevanînê raste karekî pîroz dikin, lê zehmetiyên wan jî di milê peydakirina pêwîstiyan û hatûçûnê de hene, mehane civîn ji qewmîtê lihevanînê re tên çêkirin, ji bajarok tên navçeyan û berdevkên navçeyan tên kantonê, rapora xwe ya mehane diyar dikin, di dawiyê de berdevkên kantona Hesekê û Qamişlo bi me re civîna xwe li dar dixin, ji bo wê ev pêwîstî û hatûçûnê de hewcedarî hêzeke darayî ye, ji ber ew Kesên dildarin û bi dildarî kar û xebatê dikin. Bi hêviya sala 2024`an sala azadiya gelê me û ya Rêber Apo be, gel me ji zlim û zorê xelas bibin, dagirkerên Kurdistan têk herin, em jî weke gel destê xwe bidin hev biratiya xwe zêde bikin û civakekî ji bê pirsgirêk vala ava bikin.”

Desteya Tendrustiyê di nava salekê de pirojeyên girîng pêk anîn

Birûc Resûl/Qamişlio

Hevseroka Desteya Tendrustiyê ya Herêma Cizîrê Hediya Abdullah diyar kir ku wan di nava salekê de gelek kar û xebat dane meşandin û pirojeyên girîng pêk anîn. Herwiha da xuyakirin ku wan herî zêde zehmetî di milê peydakirina dermanan de, dît.

Desteya Tendrustiyê her sal li gorî hewcedariya herêmê di milê tendirustiyê de gelek pirojeyan dide pêş xwe. Her wiha li gorî derfetên heyî, di milê tendirustiyê de ji bo gelên bakur û rojhilatê Sûriyê kar û xebatên cûr bi cûr dide meşandin. Di heman demê de ji pêşxistina milê tendirustiyê gelek pirojeyên girîng yên ji bo xizmeta gel pêk tîne.

Dxesteya Tendrustî her sal pirojeyên nû didin pêşiya xwe li ser bingiha pêwîstiya gel bi tendrustiyê, mînak berî niha amûrên renîn mexnatîzî tune bûn, lê berî sê salan hat peydekirin, her wiha nexweşxaneya şiştina gurçikan ew jî tune bû, berî 4 salan ew jî hat vekirin, ev yek jî li gor pêwîstî û daxweaza gel bû. Di heman demê de ji ber ku pêwîstî bi kargiha oksîjênê hebû, ew

jî hat vekirin. Beriya wê oksejenpir kêm di nava nexweşxaneyan de dihat belavkirin, têra şêneyan jî nedikir, her wiha derfetên gel tune ye ku derbasî nexweşxaneyên Taybet bibin, ji ber ku nirxên tedawiyê pir buha bû û zihmetî didîtin.

Pirojeyên Desteya Tendrustî yên 2023`an de

Yek ji pirojeyên Desteya Tendrustiyê, danîna amûrên mamografî li nexweşxaneya bajarê Hesekê ji bo tesbîtkirina penceşêra sîngê li cem jinan. Berî niha li her du kantonan amûrek tenê hebû, her wiha Desteya Tendrustiyê li kantona Hesekê yek din jî zêde kir. Yek ji pirojeyên Desteya Tendrustiyê yên 2022`a jî vekirina nexweşxane li bajarê Şedadê bû, ji ber ku li derdora Şedadê tenê nexweşxaneyên taybet hebûn têra Şedadê û gundewarên wê nedikirin. Ji ber vê yekê Desteya Tendrustiyê nexweşxane ji bo gel da vekirin lê hemû beş li nexweşxanê nehatin vekirin, tenê beşên lezgîn hatin vekirin lê di pirojeyên di sala 2023`an de beşên lênerîn, jin, zarok, beşên xwînê û beşê hadinê zarokan ku ji nû çêdibin vekirin. Pirojeya sêyemîn çeksazkirina mistosifên yê ku heyî û ji hemû aliyan wê çareser bikin, wekî peydakirina amûran û dermanan.

Pirojeya din berferhkirina beşê zarokan li nexweşxaneya gel a li bajarê Hesekê, ji ber ku hijmara nexweşan zêde dibin, ji ber vê yekê pêwîst hat dîtin ku beşê zarokan berfereh bikin. Her wiha di nav de wê beşê xwînê û hedanê wê berfereh bibin. Li nexweşxaneiya bajarê Dêrikê a şuştina gurçikan hin kêmanî tê de hebûn, di nava sala nû de wê Desteya Tendrustiyê wan kêmaniyan çareser û temam bikin. Bi gişt î ev pirojeyên ku nehatine qedandin.

Nexweşxaneya bajarê Qamişlo a gel li navçeya Amûdê berî neha Desteya Tendirustiyê a bakur û rojhilatê Suriyê pê rabû, lê di dema niha de bi fermî radestî Desteya Tendirustiyê a herêma Cizîrê hat kirin, her wiha niha hatiye sekinandin, berdewamiya avakirina wê di sala 2024`an de wê were destpêkirin. Beşê din jî peydakirina dermanan ji bo mistewsif, sazî û bi taybet nexweşxaneyan.

‘Armanca me rehetiya gelê me ye’

Di heman çarçoveyê de Hevseroka Desteya Tendirustiyê ya Herêma Cizîrê Hediya Abdullah diyar kir ku ew astengiyan di milê peydakirina dermanan de dibînin û wiha li axaftina xwe zêde kir: “Astengiyên ku em têde derbas dibin peydakirina hin cureyên dermanan e, bi taybet jî di hin rewşên awarte de , hin derman hene zêdeyî derfetên desteyê ne û em bi qasî ku ji destê me tê em hewl didin dermanan ji bo gelê xwe peyda bikin. Armanca me rehetiya gelê me ye. Lê dema ku gel jî bi me re alîkarbin di vî milî de wê karê me serkeftîtir be û bîhtir bi rêk û pêk be, ji ber ku em û gelê xwe hevdû temam dikin û hêviyên me ji gelê me heye ku alîkariya me di milê paqijiyê de bikin, da ku em karibin jiyaneke bi tendirustî bijîn.”

Xwenasîn

Civaka komunal

Rohat Bulut

Di jiyana rojane de gelek caran em ne di ferqa pêkhateya civakbûyîna xwe de ne. An jî em zêde girîngî û wateyê lê bar nakin. Dibe ku ji me re car na bêwate jî were. Yan jî ji ber hin sedemê û aciziyan em xwe ji civakê dûr bixin. Di raştiya xwe de ev jî heye ku em çiqasî di ferqa xwe, hebûn û rişta xwe ya civakî de ne? Em çiqasî wekî kes, tişta ku ji me tê xweştin pêk tînin? Pêywira xwe ya mirovî ya civakî bi cih tînin? Beriya her tiştî ya pêwîstî ew e ku mirov li xwe biwarqil e, xwe û hebûna xwe û pêywira xwe ya civakî bizanibe.

Em werin ser mijarê; Hin pîvanên sereke yên civakî hene, hin hêmayên civakî yên jiyana hevpar ava dike hene. Yek ji hêmayên sereke ya ku civakbûyînê ava dike û diparêze komunalbûyîn e. Di bingeha xwe de pûxte û cewhera civakbûyînê ji komunaliyê tê. Wekî ferd û endamê civakê pêwîste mirov vê yekê bizanibe û peywira xwe bi cih bîn e.

Li vir em cend pirsên din lê zêde bikin û bidomînin. Gelo civakbûyîn çima ji bo mirovan ewqas girîng e? Yan jî komun ji bo mirov û civakê bi xwe re çi tîne? Belê dema em bala xwe didin rasiya mirov; bi hêsanî dide xuyakirin ku mirovek bi serê xwe nikare bijî û hebûna wî/wê jî nepêkan e. Mirov bi civakbûyînê re dibe mirov. Lê belê wekî me got hin pîvanên sereke yên civakbûyînê jî ava dikin hene. Ya sereke jî kumanlî ye. Lewre hemû berhemên mirovî di ancama komunaliteyekê de derdikeve holê. Hebûna civakbûyîn bi xwe jî di nav de encama komunaliyê ye. Kombûna fikir û raman, kombûna mirovan, kombûna nirxan, kombûna bermahiyan, kombûna hest û helwestan, kombûna çand, ziman, exlaq û derketina holê ya edalet, wekhevî, azadî, demokrasî û hwd. hîma avakariya civakê ye. Di heman demê de kombûna hemû nirxan e ku girîgî û pîroziyê digire. Mirov dikare bêje ku taybetmendiya sereke ya ku civakê dike civak komune. Avaniya civakî bi komunalî pêk tê, îfade û pênaseya herî rast a ji bo civakbûyînê ev e. Di heman demê de ji vê re wekî pêvajoya civaka xwezayî ya bi pêşengiya jinê jî tê gotin û pênasekirin.

Civaka komunal her wiha ew civaka ku xwezaparêz e, li dijî serwerî û hiyerarşiyê ye. Lewre hişmendiya serwer û hiyerarşîk li dijî nirxên civakbûyînê ye. Di rastî û cewhera civakê de mirov nikare behsa serwerî û hiyeraşiyê bike. Civak bi xwe jî serwerî û tehakumê napejirîn e. Îro jî dema ku behsa demokrasiyê tê kirin, ew qonaxa civakî ya ku têkiliyên di nav xwe de yên exlaqî û civakî dertê pêş.

Belê dema behsa civaka komunal tê kirin, nirxên bingehîn ên civakê tên hişê mirov. Ji ber ku civakbûn şertê hebûna mirovan e, komunalbûn û bi awayekî komunî tevgerîn jî tê wateya awayê hebûna mirov. Di vî warî de civakbûn tê wateya komunalbûnê jî. Heke mirov bixwaze hebûna xwe biparêze, heke mirov bixwaze, gel û civaka xwe biparêze ev bêyî komunalî nepêkan e. Mirov bi komun û civakbûyîna xwe heye. Ewqas girînge ku ew nebe mirov û civak jî nabe. Di civakeke komunal de gelek nirxên mirovahiyê di nav xwe de veduxwîn e.

Civaka komunal ji bilî hebûna pergalê, tevî hemû êriş û bandorên neyînî yên pergala dewletparêz a hiyerarşîk, weke civakbûneke nedewletî hebûna xwe didomîne. Îro jî dema em bala xwe didinê pergala Rojava vê yekê bi hemû hûrgiliyê xwe de radixe ber çavan. Bi taybetî jî ji bo gelê kurd tişta herî girîng û pêwîst jî îro ev pergala civaka kumanal e. Tenê di gotinê de nabe, ya pêwîst kar û xebat e.

‘Berxwedana Gel wê êrişên dagirkeriyê pûç bike’

Dewleta Tirk a dagirker bi armanca qirkirina gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha têkbirina destkeftiyên heyî êrişên xwe dewam dike. Di 25’ê Berfanbarê de dagikeriyê li Qamişlo, Amûdê û Kobanê 22 navendên xizmetguzariyê bombebaran kir, di encamê de 8 welatî şehîd bûn, 13 birîndar bûn û ziyaneke mezin a madî pêk hat. Rêveberiya Xweser A Demokratîk , QSD , Partî û tevgerên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyan êrişên dagirkeriyê şermezar kirin û gotin, berxwedana gel wê tevahiya êrişan pûç bike.

Navenda nûçeyan

Dewleta Tirk a dagirker bi armanca qirkirina gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha têkbirina destkeftiyên heyî êrişên xwe yên li dijî gelên herêmê dewam dike. Dagirkerî di êrişên xwe de rasterast binesaziya herêmê, navendên xizmetguzariyê û sivîlan dike armanc. Herî dawiyê di şeva 23’ê Berfanbarê dagirkeriya Tirk bi riya balafirên şer yên bêmirov dest bi êrişeke berfireh kir. Di êrişî de stasyonên elektîrk, navendên berhemdayîna petrolê û gazê, navendên xizmetguzariyê û kargeh bûn armanc . Di dewamiya êrişên dagirkeriyê de di 25’ê Berfanbarê de di nava 24 seatan de li Qamişlo, Amûdê û Kobanê 22 cih hat hedefgirtin. Herwiha Di encamê de zerareke mezin gihişt navendên xizmetguzariyê, 8 welatî şehîd bûn û 11 jî birîndarbûn.

Rêveberiya Xweser A Demokratîk , QSD , Partî û tevgerên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyan êrişên dagirkeriyê şermezar kirin û bang NY kirin ku li hemberî êrişan helwsta xwe nîşan bide.

‘Em ê destkeftiyên gel biparêzin’

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derabrê êrişan daxuyaniyek da û tê de destnîşan kir ku ew ê li dijî êrîşan gel û destkeftiyên wan biparêzin û bang li hemû pêkhateyan kir ku wekî her care bi yekrêzî tevbigerin. Herwiha Rêveberiyê bang li NY, koalîsyona navnetî, Rusya û Hikûmeta Şamê kir ku helwesta xwe nîşan bidin û bêdeng nemînin.

‘Yê tê hedefgirtin gel e’

Di heman çarçoveyê de Navenda Ragihandinê ya QSD`ê daxuyaniyek li ser malpera xwe parve kir û tê de diyar kir ku di êrişan de tu tiştek bi hêzên wan nehatiye û cihên hatine hedefgirtin hêzên wan lê nîn in û yê rasterast hatiye hedefgirtin gelê herêmê ye.

QSD’ê da zanîn ku li hemû qadan di serî de li hember êrîşên dewleta Tirk a terorîst û faşîst, li dijî her cure êrîşan ji her demê zêdetir ew ê gel biparêzin û wiha got: “Pêwîst e rêveberî û rejîma faşîst a Tirk zanibe ku li beramberî gelekî bûye fedaî ti şansê wê yê serketinê nîne. Yekîtiya bi zanebûn û berxwedana bi awayekî rêxistinkirî ya gelên Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê dikare hemû êrîşan pûç bike.”

‘Armanca êrişan têkbirina aramî û ewlehiya herêmê ye’

Derbarê êrişên dagirkeriyê de 33’ê Partî û tevgerên siyasî yên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyeke hevbeş êrişên hewayî yên dewlet Tirk a dagirker şermezar kirin.

Di daxuyaniyê de hat bibîrxistin ku dewleta Tirk a dagirker 23’yê Kanûnê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê binesaziyê enerjiyê, navendên petrol û ceyranê bombebaran kirin. Partiyan bi tundî êriş şermezar kirin û got armanc ji van êrişan têkbirina ewlehî û îstiqrara herêmê ye. Di dewama daxuyaniyê de hate diyarkirin ku dewamkirina êrişên li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rewşê aloztir dike û ewlehî û îstiqrara herêmê dixe metirsiyê. Hêjayî gotinê ku dema nûnera Partiya Nûjen û Demokratîk a Sûriyeyê Heyfa Mehmûd daxuyanî dixwend, balafirên bêmirov ên biçek ên dewleta Tirk a dagirker li nêzî cihê dayîna daxuyaniyê gelek dever bombebaran kirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xebatên siyasî û dîplomatîk

Navenda nûçeyan

Hevpeymana Civakî ya nû, kongreya 4’an a MSD’ê, lidarxistina civîn û pêkanîna hevpeymanan jî di nav de, gelek xebatên siyasî û dîplomatîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatin meşandin.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo pêşxistina xebatên xwe yên siyasî û dîplomatîk, avakirina têkiliyên bi welatên Ewropa û welatên din ên cîhanê re, kar da meşandin. Nûnertiya Rêveberiya Xweser li deverên cuda yên Ewropayê bi dehan hevdîtin pêk anîn.

Ji 9’ê Çileya 2023’yan heta 21’ê Cotmehê 12 şande ji Spanya, Barbados, Fransa, Slovakya, Kirgizistan, Federasyona Rûsyayê, Sûdan, Norwêc, Kanada, Zelandaya Nû, Tacîkistan û Danîmarkayê 16 serdan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk anîn. Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser 529 zarok û jinên DAIŞ’î li gorî protokolên fermî radestî hikumetên welatên wan kirin.

10’ê Çileyê MSD û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyeyê li ser plana xebata hevbeş li hev kir.

9’ê Sibatê Rêveberiya Xweser ji bo piştgiriya bi mexdûrên erdhejê re pêngava “Bi hev re ji bo mirovahiyê” da destpêkirin.

9’ê Sibatê Rêveberiya Xweser 20 kamyonên alîkariyên mirovî ber bi herêmên dagirkirî ve şandin, lê dewleta Tirk a dagirker li pêşiya alîkariyan girt.

10’ê Sibatê Rêveberiya Xweser 100 tankerên mazotê ber bi Şehba û Helebê ve bi rê kirin.

5’ê Adarê Serokê Desteya Erkanê ya Hevbeş a DYA’yê general Mark Milley serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir.

20’ê Adarê nûnera MSD’ê Sînem Mihemed bi serokê DYA’yê Jeo Biden re civiya.

30’ê Adarê Daîreya Têkiliyên Derve gelek rapor li ser sûcên dewleta Tirk a dagirker ji aliyê navneteweyî re sand.

18’ê Nîsanê Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê beyannameyeke ji 9 bendan ragihand.

27’ê Nîsanê Rêveberiya Xweser komîteyek ji bo garantiya vegera ewle ya welatiyên xwe yên li Sûdanê asê mane, ava kir.

28’ê Nîsanê Rêveberiya Xweser beyannameya çareseriyê bi gelek aliyên navneteweyî re parve kir.

30’yê Nîsanê Rêveberiya Xweser ragihand ku ew amade ye pêşwaziya penaberên Sûriyeyê yên li Lubnanê bike.

16’ê Gulanê Şaredarî û meclisa bajarê Floransa yê Îtalyayê xelata ‘Gigli D’oro’ da şehîd Hevrîn Xelef.

18’ê Gulanê Kongreya Yekemîn a Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat lidarxistin.

23’yê Gulanê Hisên Osman ji bo hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hat diyarkirin.

30’yê Gulanê Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê ji bo parastina zeviyên çandiniyê seferberî ragihand.

31’ê Gulanê Rêveberiya Xweser 369 welatiyên xwe yên li Sûdanê asê mabûn, derxistin.

10’ê Hezîranê Rêveberiya Xweser ragihand ku dest bi darizandina DAIŞ’iyên biyanî bike.

20’yê Hezîranê hevseroka Meclisa Kantona Qamişlo, Yusra Derwêş, cîgira hevserokatiya meclisê Leyman Şiwêş û endamê meclisê Firat Toma di êrişeke dewleta Tirk a dagirker de şehîd bûn.

24’ê Hezîranê MSD û Heyet El Tensîq El Wetaniye “belgeya lihevkirinê” îmze kir.

26’ê Hezîranê 256 malbat ji Girê Spî ya dagirkirî reviyan û xwe li herêmên Rêveberiya Xweser girtin.

3’yê Tîrmehê Gerînendeya Avê ya Hesekê bajar wekî devereke bobelatê ragihand.

6’ê Tîrmehê komxebateke navneteweyî li ser Peymana Lozanê hat lidarxistin.

7’ê Tîrmehê Rêveberiya Xweser 11 kesên di peravên Cezîrê de xeniqîbûn, radestî malbatên wan kirin.

8’ê Tîrmehê Kongreya Navneteweyî ya Duyemîn a Ol û Baweriyên Mezopotamyayê hat lidarxistin.

13’ê Tîrmehê der barê komkujiyên li Mezopotamyayê û bandora wan li jinan de komxebatek li ser asta Rojhilata Navîn hat lidarxistin.

16’ê Tîrmehê nûnerê Rêveberiya Xweser ê li Lubnanê serdana wezîrê karên derve yê Lubnanê kir.

17’ê Tîrmehê komxebata Sûriyeyê ya Şoreşa 19’ê Tîrmehê hat lidarxistin.

13’ê Tebaxê Hevdîtina Nîştimanî ya Heleb hat lidarxistin.

25’ê Tebaxê MSD’ê piştgiriya xwe bi xwepêşandanên gel ên aştiyane yên li deverên cuda yên Sûriyeyê re nîşan da.

27’ê Tebaxê Rêveberiya Xweser mûcên karmendên xwe ji sedî sed zêde kir.

29’ê Tebaxê Komîteya Têkildarî Widahiyên li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat avakirin.

9’ê Îlonê Rêveberiya Xweser sersaxî ji malbatên qurbaniyên erdheja li Mexirbê re xwest.

13’ê Îlonê 174 malbatên iraqê ji kampa Holê derketin.

26’ê Îlonê Rêveberiya Xweser ji ber şewata li Mûsilê sersaxî ji gelê Iraqê re xwest.

27’ê Tîrmehê nûnerên Rêveberiya Xweser ê li Lubnanê binpêkirinên ji aliyê dewleta Tirk a dagirker re bi Meclisa Mafên Mirovan re parve kirin.

4’ê Cotmehê artêşa Tirk a dagirker êrişên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê zêdetir kir.

5’ê Cotemhê Konferansa Yekemîn a Parastina Zarokan li Reqayê hat lidarxistin.

6’ê Cotmehê Rêveberiya Xweser sersaxî ji malbatên qurbaniyên êrişa li Humisê re xwest.

7’ê Cotmehê Rêveberiya Xweser ragihand ku du navendên rehabîlîtasyonê çeteyên DAIŞ’ê sekinin.

8’ê Cotmehê ji ber êrişên dewleta Tirk ji sedî 80’ê stasyona Siwêdiyê ji xizmetê derket.

9’ê Cotmehê di êrişa hewayî ya dewleta Tirk a dagirker a li dijî Akademiya Hêzên Têkoşîna li dijî Madeyên Hişbirê de 29 endam şehîd bûn.

9’ê Cotmehê Rêveberiya Xweser ji bo şehîdên êrişa li ser akademiyê 3 roj şîn îlan kir.

11’ê Cotmehê di êrişa dewleta Tirk a dagirker de 47 kes şehîd bûn û 59 kes jî birîndar bûn.

12’ê Cotmehê Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistanê (YNK) li bajarê Silêmanî yê Başûrê Kurdistanê bi şandeya MSD’ê re civiya û rewşa li Sûriyeyê û li bakur û rojhilatê wê nîqaş kirin.

18’ê Cotmehê kongreyeke giştî li Kantona Dêrazorê hat lidarxistin.

23’yê Cotmehê Kongreya Yekemîn a Xwedî Pêdiviyên Taybet hat lidarxistin.

24’ê Cotmehê Rêveberiya Xweser dosyayek li ser êrişên dewleta Tirk a dagirker radestî aliyên hiqûqî yên navneteweyî kir.

5’ê Cotmehê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ’Kongreya Navneteweyî ya Parastina Mîrasa Madî û Nemadî’ li dar xist.

10’ê Cotmehê Rêveberiya Xweser Mîhrîcana Çanda Neteweya Demokratîk li dar xist.

24’ê Mijdarê pêşbirkeke hespan li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat lidarxistin.

2’yê Kanûnê Rêveberiya Xweser bicihkirina filistîniyan li Efrîna dagirkirî şermezar kir.

12’ê Kanûnê Hevpeymana Civakî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat îmzekirin.

20’ê Kanûnê Kongreya 4’emîn a MSD’ê hat lidarxistin.

Rêber Apo hêvî û vîna gelan e

Ji bo azadiya fîzîkî ji Rêber Ebdullah Ocelan û çareserkirina siyasî ji pirsgirêka gelê kurd re, di 10'ê Cotmehê de kampaniyek cîhanî li Silovîna hat destpêkirin, û li hemû welatên cîhanê deg veda. Berpirsê raghandina PYD'ê Husên Feqa, diyar kir ku Rêber Apo vîn û hêviya tevahiya gelê kurd e, û got bi azadiya Rêber Apo wê tevahî alozî û pirsgirêkên herêmê çareser bibin.

Deriya Çiya/Qamişlo

Derbarê vê mijarê de û Ji bo ku em nas bikin ku armanca vê Kampaniyê û girîngiya wê di vê demê de tê çi wateyê? Me hevpeyvînek bi awayekî berfireh bi Berpirsê raghandina PYD'ê li Ewropa Husên Feqa re çêkir.

Naveroka hevpeyvînê weha ye:

kampaniya cîhanî ya ji bona azadiya Rêber Apo ev zêdeyî du mehane berdewam dike, hûn pêşveçûna kampaniyê çawe dinirxînin?

Li pêş hemû gelên herêma rojhilata navîn û ji dîroka ku komplo li ser serokatî dest pê kir, siyaseteke navdewletî ya nû di Rojhilata Navîn de dest pê kir wek; hêzên navdewletî û kapîtalîzma nûjen, bi siyasetekî nû li hember alozî û pirsgirêkên herêmî yê Rojhilata Navîn nêz bûn, da ku hinekî karibin destwerdana van aloziyan bikin û desthilatdariya xwe di rojhilata navîn de mestir bikin, îcar girîng bû ji bo wan ku aloziyên herêmê kûrtir bibin, û riya çareseriyê li pêş wan aloziyan were girtin. Da ku ev armanc jî pêk were divabû ku kesayetên berz di çareserkirina van aloziyan de bidin alî. Di serî de kesayetiya Rêber Ebdulah Ocelan bû, ku nûnertiya çareseriyê di rojhilata navîn de dikir û daxwaza azadiya tevahî gelên herêmê dikir ne tenê azadiya gelê kurd, lê ew rastî komployên navdewletî hat, ew keda çareseriyê serastî siyaseta navdewletî hat û ne li gorî hêzên navdewletî û kapîtalîzma nûjen bû, ji lewma ev kompilo birêve çû û ta radeyekê armancên xwe anî holê, lê ji wê dîrokê heya 2021'an jî Rêberê gelê Kurd Ebdullah Ocelan dikarîbû roleke mezin di hişmendiya gelê kurd û gelên herêmê de bilîze, dikarîbû ku riyên çareseriyê di herêmê de bi awayekî aştiyane bi pêş bixe. Ji dîroka 2021'an heya niha ev tecrîda ku li ser Rêbertî bi rê ve diçe û berdewame, ne tenê tecrîda li ser Rêberê gelê kurd Abdulah Ocelan e, ew tecrîde li ser gelê herêmî û gelê kurd bi giştî ye. Û rêgirtina rê li hember çareseriya hemû aloziyên rojhilata navîn, di serî de doza gelê kurd. Hêzên navdewletî û welatên ku kurdistan bi herçar parçeyên xwe dagir dikin, ku ne ji bo berjewendiyên wan ban e wê niha ev alozî çareser bûbane, lewma ev tecrîda li ser Rêbertî heya niha berdewam dike, **kampaniya heta niha çawa birêve diçe, tevlîbûn jê re çawaye, hûn çalekiyên heyî û asta wan çawe dinirxînin?**

Kampaniya azadiya serokatî heya niha gihştiye astekî bilind, û bi awayekî pêşketî bi rêve diçe, di vê kampaniyê de bi meliyonan imze hatin komkirin, bi dehan bilatforim li bajarên Ewropî hatin lidarxistin, wek nimûne li Lozanê bilatformek hat lidarxistin ji bo şikandina tecrîda li ser Rêbertî, û him jî ji bo çareserkirina doza kurdî, li pêş perlemana Elmanî Berlîn li bajarê Kolin, Firayborg û li Cinêvê wê li dehan bajarên Ewropî ev bilatforim bên lidarxistin, di vê astê de gelek deng di nav perlemana Ewropa de bilind bûne, ew deng jî daxwaza şikenandina vê de daxwaza azadî û şikenandina tecrîda li ser Rêbertî dikin, heya niha di asteke bilind de birêve diçe. Ev kampaniya wê berdewam bin heya ku bighêjin aramaca azadiya fîzîkî ya Rêber Ebdullah Ocelan û çareserî ji doza kurdî.

Ji bo kampaniya azadiya Rêbertî li ser asta cîhanê biserkeve pêwîste çi were kirin?

ji bo ku ev kampaniya bi ser bikeve, pêwîst dikê ku bi şêwayekî cidî hewldan bi pêş bikevin û di nav saziyên navnetewî de hertim dubare bibin, heya ku ev doz bê çespandin û tekezkirin. Ev saziyên ku li dijî işkenceyê ne divê hewldan bi şêwazakî fermî bê kirin, da ku ev deng derkevin û daxwaziya şikenandina vê tecrîdê û kar ji bo

holê, û ew deng bibin yek. Ev kampaniya di nav tevahî cîhanê de hat lidarxistin ji bo ev kesên çalekvan û xweyê bandor di duniyayê de bi kesayetên ku dikarin rola xwe di nav raya giştî de bilîzin diviyabû ku mirov xwe bighîne wan û ev deng bibin yek. Armanc di vê qonaxê de girêdayî girîngiyên çareserkirina aloziyan, ji lewma heya niha gelek hewldan hatine kirin, gavên gelek mezin jî hatine avêtin, hemû saziyên navdewletî û yên mafên mirovan, kesayetiyên ku xelata nobilê girtine û xwedî bandor dengê wan ji bona daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêber Ebdullah Ocelan û çareseriya doza kurd bûne yek. Di aliyê fermîbûna van saziyan de heya niha li gor desthilatdariya kapîtalîzên nûjen, ev saziyên mafên mirovan yên ku peywendîdar nikarîbûn rola xwe bi awayekî fermî bilîstane, lê ew hewldan wê hertim berdewan bin da ku bi şêwayekî fermî di siyaseta navdewletî de ev daxwaz bên tekeskirin.

tecrîdê dikin. Herwiha şandeyek rêxistinî ji jinên navdewletî serdana Tirkiya kiribûn, di vê mijarê de hinek daxwaz dabûn, lê heya niha faşîzme Tirk di vê demê de him bi faşîzimbûnê nêzî doza gelê kurd dibe, him jî bi vî awayî nêzî doza azadiya Rêbertî dibe, ji lewma jî guhên wan li pêş van daxwaziyan girtî ne. Bi sedan akadimisiyan, rewşenbîr, rojnameger, siyasetmedar, bi dehan partiyên Çep li Ewropa tevlî vê kampaniyê bûne, hemû kesên azadî û demukrasîxwaz yên ku li doza azdî, aştî û demukrasiya herêmê digerin bi dehan ji wan dengan tevlî vê kampaniyê bûne. Di serî de gelê kurd yên li herçar parçeyên kurdistanê, herwiha ji bo şikandina tecrîda li ser Rêbertî kampaniyeke girava berçîbûnê di hundirê zindanên Tirkiyê de destpêkir, ew jî piştîvaniyek ji bona kampaniya li Ewropayê destpêkirî bû. Bi hezaran gelê me tevlî vê kampaniyayê bûn û heya niha berdewam e. Ev dengên ku di duniyayê azadiya fêzîkî ji Rêber Ebdulah Ocelan re bê kirin. Ji lewma di vê qonaxê de pêwîst dike ku hemû gelên azadîxwaz tevlî vê kampaniyê bibin. Herwiha pêwîstiyeke mezin bi darxistina kongirên navnetewî heye, ku bi armanca azadî ji bo Rêbertî û çareserkirina doza kurdî darbikevin, ne tenê li Ewropa lê li tevahî cîhanê. pêwîste ew encamên ku ji kongireyan bên girtin bighin saziyên navnetewî, da ku karibin bi şêwazekî ji şêwazan fişarê li ser desthilatdariya Turkiyê bikin, da ku ev tecrîda li ser Rêbertiyê bê şikenandin. Di vê mijarê de ji nêzîkbûna gelê me ji bo vê kampaniyê pêwîste ku di vê hişmendiyê de pêş bikeve. Ji ber ku azadiya Rêber Ebdullah Ocelan çareseriya ji bo doza kurd û hemû gelên rojhilata navîn e. Lewma jî girînge ku hemû gelê Kurd û dostên kurdan yên azadîxwaz tevlî vê kampaniyayê bibin.

Êrişa dagirkeriya Tirk têkçûyîna wê nîşan dide

Dilyar Cizîrî

Dewleta Tirk a dargirker careke din ji roja 24'ê Kanûnê ve destpê kir binesaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dijwarî bombebaran û topbaran kirin. Di encamê de navendên tenduristiyê, depoyên genim, stasyon, benzînxane, kargeh, çapxane, cihên hilberîna neftê, xazê û her wekî din gelek cihên bi jiyana gel ve girêdayî kirin armanc. Vê carê jî Wezareta Parastinê ya dagirkeriya Tirkiyê li xwe mukir hat ku artêşa wan li herêmên Parastina Medya derbeyên giran ji gêrîla xwarine, ji lewra êriş pêk anîne. Ev mukirhatina dewleta Tirk rast aliyekî merseleyê ye. Aliyên din jî ragihandina hevpeymana civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku wekî destkeftiyekî din a hevgirtina gelên wê ye. Ji destpêka şoreşa Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve, dewleta Tirk bi hemû hêza xwe hewl dide rê nede gelên herêmê yekîtiya xwe bi hêztir bikin.
Pê re jî lidarxistina Kongreya 4'an a Meclîsa Sûriyaya Demokratîk (MSD) û beşdarbûna nûnerên ji tevahî xaka Sûriyê sedemeke din e. Di wir de destnîşankirina nexşeriya çareseriyê, kîna dewleta Tirk û Erdogan hîn zêdtir derxiste hole. Bi taybet ji ber bi salane dewleta Tirk û Erdogan di nava hewldanan de ye ku nexşreyên taybet bi xwe li ser gelê Sûryayê feriz bikin. Lê heta niha hemû hewldanên wan naghêjin armancê. Tişta wê yekê jî isbat dike, heta niha nikarin aramiyê li herêmên dagirkirî pêk bînin.
Dewleta Tirk ji destpêka şoreşa galan a Sûriyê ve û heta niha her şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê destkeftiyan bi dest dixe, êrişên nû pêk tîne. Bi vê jî dixwaze temenê komên xwe yên çete DAIŞ, El-Nusra, Artêşa Nîştimanî bi hemû nav û şeklên xwe biparêze û temenê wan dirêj bike. Ew di ser wan çeteyan re plan û projeyên xwe yên dagirkeriya xaka Sûriyayê pêk tîne. Ji ber wê jî bi hedefgirtina binesaziya herêmê dixwaze gelê herêmê bi tirsîne û wan ji xeta çareserî û azadiyê dûr bixîne.
Armancgirtina karmednên sivîl û saziyên xizmetguzariyê û yên tenduristiyê li gorî yasayên Neteweyên Yekbûyî sûcê di nava şer de ye. Lê dewleta Tirk bêyî tu aliyên navdewletî li dijberiya xwe bibîne, bi rehetî êrişên xwe pêk tîne. Ne Rûsiya û ne jî Amerîka yên qaşo garantorin erka xwe pêk nayînin û bi bê dengiya xwe di êrişên li dijî herêmê de dibin şirîkên dewleta Tirke. Di heman demê de Neteweyên Yekbûyî û sazî û dezgehên wan ên taybet bi Sûriyayê hemû binpêkirin û sûcên şer ku dewleta Tirk li dijî gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne, dibîne û gelek rêxistinên girêdayî wan xal bi xal wan belge dikin.
Lê her çendî êriş têne kirin û aliyên navdewletî yên garantor bê deng in jî, gelê herêmê ku hema bêje rojane şehîdên destkeftiyan oxir dikin, bi muraleke mezin ji bo parastina destkeftiyên xwe tê dikoşin. Gelên herêmê û hêzên wan ên sivîl û leşkerî mutleq wê bersiva hemû êrişan bidin û wê serkeftinên mezin bi dest bixin. Ên têkçûyî jî dewleta Tirk a êrişkar e. Yenî pir bi hêsanî mirov dikare bibêje dijwariya êrişên dewleta Tirk têkçûyîna wan nîşan dide.

'Bi dorpêçê wê nikaribin vîna gelan bişkînin'

Endamên MSD`ê yên Şêxmeqsûd û Şehbayê diyar kirin ku bi sedema dorpêçê gel di hemû beşên jiyanî de astengiyan dikşînin û gotin; Bi hêz û berxwedaniya gel wê dorpêç têk biçe.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Di 18`ê Adara 2018`an de, dema dewleta Tirk a dagirker herêma Efrîn dagirkir, bi hezaran şêneyên herêma Efrîn koçberî Şehba, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên girêdayî bajarê Helebê bûn. Ji wê demê ve û heta niha, hikûmeta Şamê li ser herêma Şehba, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dorpêçeke giran feriz kiriye. Hikumeta Şamê nahêle ku sotemenî, madeyên xwarinê û pêdiviyên tenduristiyê derbasî herêman bibin û ev yek dibe sedema jiyaneke zor û zehmet, di heman demê de jî li kêleka dorpêçê dewleta Tirk a dagirker rojane êrîşên xwe li ser van herêman pêk tîne.
Di derbarê dorpêça li ser Şehba û taxên Şexmeqsûd û Eşrefiyê, endamên MSD`ê yên Şêxmeqsûd û Şehbayê Bêrîvan Elî û Fatma Elhiseyno ji rojnameya me re axivîn. Endama Têkiliyên Meclisa Sûriyeya Demokratîk a navenda taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Fatma Elhiseyno diyar kir ku ji destpêka koçberkirina gel ji Efrînê û bi cihbûna wan li Şehbayê, her dem dorpêç ji aliyê hikumeta Şamê ve li ser wan tê ferzkirin û wiha got: "Piştî bajarê Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hat dagirkirin û em koçberî bajarê Helebê bûn, gelên Efrînê li Şehba û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi cih bûn, herwiha ji wê demê û heta niha jî hikumeta Şamê dorpêçeke giran li ser gel feriz dike, bi taybet her sal di demsala zivistanî de, dorpêçê girantir dike. Ji ber dorpêçê gel astengiyan di hemû beşên jiyanî de dikşînin wekî; aboriya zehmet ku tevahî gelên Sûriyê di vî aliyî de bi zehmetî jiyan dikin û dorpêça taybet ku li ser gel li Şehba, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê tê ferzkirin."

Qotkirina pêdiviyên jiyanî bûye astengiyeke mezin

Fatma Elhiseyno di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku bi derbasbûna demsala zivistanî re zehmetiyên gel girantir dibin û wiha got: "Bi derbasbûna demsala zivistanî re, zehmetî û astengiyên gel girantir dibin, ji ber qotkirina madeyên sereke wek sotemenî, gaz û dermanan, bandoreke neyênî li ser malbatan dibe, bi taybetî malbatên xizan ku derfetên wan tuneye pêdiviyên xwe yên jiyanî peyda bikin, herwiha kesên temen mezin jî ji ber sermayê nexweş dikevin. Di heman demê de, ji aliyê firqeya 4`an ve bazirgan rastî astengiyan tên û ev yek bandorê li ser bihabona her tiştê jiyanî dike, ji ber firqeya 4`an baca ji bazirganên ku kel û pelên derbasî herêma me dike distîne, ji ber vê yekê bihabona kel û pelan hîn zêde dibe wek sebze cil û hwd… bi sedema qotkirina sotemeniyê enrîjî jî hatiye qotkirin, rewşa dibistanan jî ji bo zarokan zehmetir bûye, nexweşane jî ji kar hatine rawestandin, di heman demê de, derman jî li ser herêma me qot bûye. Şêxmeqsûd hejmareke baş ji malbatên Efrînî digire nava xwe û qotkirina hemû beşên jiyanî astengiyeke mezin li ser van malbatan dike."

'Li hemberî dorpêçê berxwedaniya gel xurtir bûye'

Fatma Elhiseyno

Bêrîvan Elî

Endama Têkiliyên Meclisa Sûriyeya Demokratîk a navenda taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Fatma Elhiseyno axaftina xwe wiha qedand: "Armanc ji dorpêçê ew e ku vîna gel bişkîne û pirojeya netewa demokratîk e têk bibe. Lê her kes nas dike gelê me berxwedêre, bi hezaran cangoriyên wê canê xwe fîdayî xaka xwe kirin e. Herwiha kombûna tevahiya gelên Sûriyê di kongireya MSD`ê yê 4'emîn de da diyarkirin ku danûstendina sûrî-sûrî li ser maseya Sûrî çarseriya hemû pirsgirêk û aloziyên li Sûriyê ye. Cudahiya pêkhateyan ne astenge, bi cuhdahiyê em dikarin bighêjin demokrasiyê û Sûriyê bi tevahî rêzgar bikin, wê demê wê koçber û penaber vegerin axa xwe."

'Pêwîste cîhan li hemberî kiriyarên hikumeta Şamê bêdeng nemîne'

Di heman çarcoveyê de endama Meclisa civaka Demokratîk (MSD) ya Şehbayê Bêrîvan Elî diyar kir ku 6 salin gel rastî dorpêçê tê û wiha got: "Ev 6 sal in gel di hundirê Şehbayê de ji 2 aliyan ve rastî dorpêçê tê, ji alikî dewleta Tirk a dagirker rojane herêmên me toparan dike û aliyê din jî hikumeta Şamê dorpêçeke giran li ser me dike. Eger DYE destûrê nede balefirên Tirkiyê nikarin van herêman bombebaran bikin. Heman tişt ji bo Rûsayê jî derbasdar e. Pêwîste tevahî raya cîhanê wê bizane. Qada hewayî di navbera DYE û Rûsayê de hatiye parvekirin. Rojavayê xeta Eyn Îsayê girêdayî Rûsayê ye. Tirkiye van dewletan agahdar dike, erêkirina wan digire û êriş dike.
Balefirên dewleta Tirk 23'ê Kanûnê êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Li çiyê tu bandora êrişên wan ên hewayî çênabin. Hewa destûrê nade. Bombebaranên wan vala ne. Lê neçare çirokek serkeftinê pêşkêşî gelê xwe bike. Her çawa be Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin destê wan de weke dilekî ye. Paraştina wê ya hewayî tune ye. Êrişî wê bike û nîşan bide çiqas li dijî terorê serkeftî û bi biryar e. Yanî ji bo nîşandayînê be jî êrişê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.
Li Sûriyê Kurdan û rêveberiya xweser a Kurd pêşengiyê wê dikin li hemberî dewleta Tirk tu şer nedane destpêkirin. Li hemberî Tirkiyê tu êriş pêk neanîne. Îlana şer tune ye. Dewleta Tirk yekalî ev şer daye destpêkirin û dimeşîne. Bi israr dixwaze ferasetek PKK û YPG'ê heman in ava bike. Dibêje, eger PKK'ê li me bixe, emê jî herin YPG, Kurdên li Sûriyê û rêveberiya wan bixin. Dixwaze vê bi cihanê jî bide pejirandin. Yanî hewl dide YPG'ê jî bixe lîsteya terorê. Beriya niha DYE û Ewropayê PKK xiste lîsteya terorê, dewleta Tirk jî heta dawî ev jî bo xirabiyê bikar anî. Weke hêncetekî jî bo tevahî sûcên xwe dinirxîne. Ji bo rêveberiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê terorîze bike tevahî rê û rêbazan diceribîne.
Rêveberiya Erdogan dibêje min deh hezaran Kurd kuştine, vê weke serkeftinê nîşan dide. Bi awayek xwezayî malbat, heval û xizmên van mirovan hene. Ev zarokên gelê Kurd in. Dê bi kuştina Kurdan aştî û biratiyek çawa çêbike? Li Tirkiyê kes vê lêpirsîn nake. Niha dibêjin leşkerên me mirine, agir ketiye mala leşkeran û propogandayên tevlîheviyê dikin. Ya dayîkên Kurd, malbatên wan, qet ev nayê aqilê wan? Kesên ji bo Filistînê digirîn û derdikevin kolanan, kesên çavê xwe ji bo Kurdan girtine û wijdana wan reş bûye, ma dê hertim wisa bimînin?
Em dîsa dubare bikin, pirsgirêk ne Kurd in. Pirsgirêk projeya qirkirinê ya dewleta Tirk e. Di demên ku Kurdan tiştek jî nedikir Kurd înkar dikin û bişaftin didomandin. Niha jî derfetên wên ên jiyanê ji holê radikin, hewl didin gel bidin koçberkirin, alioziyê çêbikin, vîna wan bişkînin û qirkirinê temam bikin. Pêwîste her kes vê raştiyê bibîne û vê yekê bi awayek rast ji cîhanê re vebêje.

Dijminahiya li dijî Kurdan xilas nabe

Zekî Bedran

Kesên weke Erdogan ku dewleta Tirk rêve dibin, hîn jî pirsgirêka Kurd a sed salî weke pisgirêka terorê pênase dikin. Heman Erdogan li ser hev daxuyaniyan dide û dibêje, "Em cihanê li dijî Israîlê rakin ser piyan, piştgiriyê bidin gelê Filistînê û şer rawestînin, agirbestê bidin çêkirin". Lê dema mijar dibe Kurd, dixwaze tevahî cihan li pişt wî bisekine, Kurdan tune bike, qirkirinê temam bike û piştgiriyê dixwaze. Cihan guherî, zanist pêşket, çavkaniyên nûçeyan zêde bûn, lê di hişmendiya yên Tirkiyê rêve dibin de tu guhertin çênebû. Bi awayek xwezayî jî gelê Kurd, Tirk û gelê herêmê berdêla vê dide.
Me beriya niha jî nivîsî, Kurd tiştekî bikin an jî nekin dê dewleta Tirk a faşîst êrişên xwe bidomîne. Pirsgirêk ne çalakiyên Kurdan in, pirsgirêk plan û niyeta dewleta Tirk e. Ev bi salane Erdogan dibêje, "Em li Sûriye, Iraq û Tirkiyê nahêlin hebûnek Kurdan çêbibe". Xuyaye ku yên bi vê hişmendiyê û biryarê, ji derveyî dijminahiyê çareseriyek din ji bo Kurdan nabînin. Zimanê ku Erdogan û şirîkên wî li hemberî Kurdan bikar tînin, zimanê tundiyê ye.
Erdogan di 5'ê Cotmehê de fermana êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê da. Wê demê hênceta wî ew bû ku herdû têkoşerên li Enqerê çalakî kirine ji Sûriyê derbasî Tirkiyê bûne! Bêguman tu delîlê wê rast derbixe tunebû. Tenê pêwîstiya wan bi hênceta êrişan hebû. Lê di êrişên xwe yên dawî de hêncetek wiha jî çênekirin. Piştî li Xakurkê derbeyek ji gerîlla xwarin hevsengiya wan tam xirab bû. Piştî ku li Zapê jî derbeyek xwarin berê balefirên xwe dane Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Cihê ku lêxistine piranî cihên petrolê, santralên elektirîkê û qadên din ên hilberînê ne. Yanî ne cihên leşkerî bûn. Cihên ku li tevahî cîhanê lêxistina wan sûc e li wir dixin. Sedemê evqas bêpewrebûna wan jî ewe ku dibêjin ji xwe Kurd bê xwedî ne, kesek hesab ji min naxwaze.
Cihên ku Tirkiye lêdixe, paraştina hewayî ya wan deran DYE yê daye ser milê xwe. Eger DYE destûrê nede balefirên Tirkiyê nikarin van herêman bombebaran bikin. Heman tişt ji bo Rûsayê jî derbasdar e. Pêwîste tevahî raya cîhanê wê bizane. Qada hewayî di navbera DYE û Rûsayê de hatiye parvekirin. Rojavayê xeta Eyn Îsayê girêdayî Rûsayê ye. Tirkiye van dewletan agahdar dike, erêkirina wan digire û êriş dike.
Balefirên dewleta Tirk 23'ê Kanûnê êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Li çiyê tu bandora êrişên wan ên hewayî çênabin. Hewa destûrê nade. Bombebaranên wan vala ne. Lê neçare çirokek serkeftinê pêşkêşî gelê xwe bike. Her çawa be Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin destê wan de weke dilekî ye. Paraştina wê ya hewayî tune ye. Êrişî wê bike û nîşan bide çiqas li dijî terorê serkeftî û bi biryar e. Yanî ji bo nîşandayînê be jî êrişê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.
Li Sûriyê Kurdan û rêveberiya xweser a Kurd pêşengiyê wê dikin li hemberî dewleta Tirk tu şer nedane destpêkirin. Li hemberî Tirkiyê tu êriş pêk neanîne. Îlana şer tune ye. Dewleta Tirk yekalî ev şer daye destpêkirin û dimeşîne. Bi israr dixwaze ferasetek PKK û YPG'ê heman in ava bike. Dibêje, eger PKK'ê li me bixe, emê jî herin YPG, Kurdên li Sûriyê û rêveberiya wan bixin. Dixwaze vê bi cihanê jî bide pejirandin. Yanî hewl dide YPG'ê jî bixe lîsteya terorê. Beriya niha DYE û Ewropayê PKK xiste lîsteya terorê, dewleta Tirk jî heta dawî ev jî bo xirabiyê bikar anî. Weke hêncetekî jî bo tevahî sûcên xwe dinirxîne. Ji bo rêveberiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê terorîze bike tevahî rê û rêbazan diceribîne.
Rêveberiya Erdogan dibêje min deh hezaran Kurd kuştine, vê weke serkeftinê nîşan dide. Bi awayek xwezayî malbat, heval û xizmên van mirovan hene. Ev zarokên gelê Kurd in. Dê bi kuştina Kurdan aştî û biratiyek çawa çêbike? Li Tirkiyê kes vê lêpirsîn nake. Niha dibêjin leşkerên me mirine, agir ketiye mala leşkeran û propogandayên tevlîheviyê dikin. Ya dayîkên Kurd, malbatên wan, qet ev nayê aqilê wan? Kesên ji bo Filistînê digirîn û derdikevin kolanan, kesên çavê xwe ji bo Kurdan girtine û wijdana wan reş bûye, ma dê hertim wisa bimînin?
Em dîsa dubare bikin, pirsgirêk ne Kurd in. Pirsgirêk projeya qirkirinê ya dewleta Tirk e. Di demên ku Kurdan tiştek jî nedikir Kurd înkar dikin û bişaftin didomandin. Niha jî derfetên wên ên jiyanê ji holê radikin, hewl didin gel bidin koçberkirin, alioziyê çêbikin, vîna wan bişkînin û qirkirinê temam bikin. Pêwîste her kes vê raştiyê bibîne û vê yekê bi awayek rast ji cîhanê re vebêje.

Operasyona şoreşgerî ya Gerîla

Farûk Sakik

Salvegera Komkujiya Duyem a Parîsê bû. Kurd û dostên wan li Parîsê li qadan bûn û doza edaletê dikirin. Meşa lêgerîna edaletê li dar xistibûn. Sonda hildana tola şehîdên xwe didan. Di demekî wiha de ji Qadên Paraştina ya Medya agahiyên operasyênên gerîla her wek tola Komkujiya Parisê girtine dihatin. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ku li Xakûrkê û Metîna derbên giran li artêşa Tirk a dagirker didan.
Artêşa dagirker bi operasyonên şoreşgerî li ser hev derbên giran xwaribû û gelek windahî dabûn. Lê artêşa dagirker û medyaya wê ya şerê taybet, hewl dida ku windahiyên xwe ji raya giştî ya Tirkiyeyê û hemû cihanê veşêre. Lê her çendî ku bikevin panîkê û hewl bidin veşêrin jî, nikaribûn bandora derbên giran ên ji Gerîlayên Azadiya Kurdistanê xwarî, veşêrin. Bi tenê cesedên di 'torbê veşartinê' de bi cih nebûbûn ji raya giştî re servîs dikirin.
Em è behsa reqamên eskerên dagirker è hatine kuştin nekin. Gerîla bixwaze diha zêde dikare encaman bi desî bixe. Gerîla bi merhamet e. Di hedefa wan de tu carî kuştina însanan (her çiqas è li hemberî wan ji mirovahiyê derketibin jî) tune ye. Demekî dirêj bû gerîla bi hin çalakiyên xwe hişyarî dida wan eskerên li heremê bi cih bûne, ku turikê xwe kom bikin û herin. Îroj jî dîsa mesaj dide dibêje turikê xwe yê cenazê hevalên xwe bigirin herin. Anjî rojek hûnê bi tabûtan herin.
Lê encamên operasyonên şoreşgerî yên gerîla, dema ku li nîqaşên ku îro li Tirkiyeyê tên kirin were nêrîn wê were ditin. Heger wezirê şer Yaşar Guler derbasî li ser sînor bûbe, herkesê texmîn bike li "Kurêjehro" gerîla çi aniye serê 200 eskerê dagirker.
Ev çalakiya gerîlayên Kurdistanê li Tirkiyê nîqaşeke nû da destpêkirin. Hin dengê cuda bilind bûn. Ji hev pirsîn çi karê me li wê heremê heye. Hikumetê mixalefet, mixalefet û hin leşkerên kevn jî hikumet rexne kirin. Lê di nav vê matmayîna wan de, car caran lehengiya gerîlayên Kurdistanê jî dihat îtirafkirin. Di media dijîtal de fotografek dihat parvekirin. Li hin avahiyên (ji avahiyan jî diyar e ku xwediyên avahiyan pir belengaz in) ku ala Tirkan daliqandibûn parvedikirin. Wan jî dixwest li vê derê de dewletê û politîkayên wan rexne bikin. Digotin aha dîsa zarokên feqîran mirin. Çima zarokên è dewlemendan naçin herêma şer. Çima ev al li qesr û qonaxan nayên daliqandin.
Lê sedemên hatina cenazeyan ev nebû. Sedem çi karê wan li axa Kurdistan hebû. Çareseriya doza Kurdistan, dagirkirina axa Kurdan nebû. Çareserkirin li hev kirine. Çareserî; mafê Kurdan ên ku bapîrên wan, ji Kurdan xesp kiribûn cardina vegerandin bû.
Heger cesareta wan û siyaseta wan ya çareseriyê tunebe, ji Rêber Apo dikarin bixwazin ku midaxale bike. Nexşerê yên Rêber Apo yên hatine ceribandin hene. Di pratîkê de jî hatiye îspatkirin. Bila li rewşa Tirkiyê ya salên 2013-14-15'an binêrin.
Di sedsaliya Komara Tirkiyê de salên herî bi aramî û dewlemendî derbasbûn ev sal bûn. Kor in û vê raştiyê nabinin. Heger di hişmendiya xwe de guhertinek çêbikin û herin Îmralî, wê wan salên bi aramî dîsa bijin.
Li gelek deverên cihanê ji Amerîka Latîn heta Japonya, însanan bawerî anîn ku bi paradigmaya Abdullah Ocalan, dikarin hin pirsgirêkên cihanê werin çareserkirin. Lê desthilatdarên Tirkiyê ji bo berjewendiyên xwe di dijminatiya Kurdan de israr dike. Dibêjin çawa be civakek bi nîjadperestî û dijminatiya Kurdan hatî jahrîkirin heye. Êdî tu çi jahriyê bidî wan bê lêpirsîn dadiqûrtîne. Xema tu kesî nîne çiqas esker li ber şûrê gerîla ketî.